## Baweriya Ahmedê Hepo

Ahmedê Hepo çavê xwe bi koçberiyê, bi biryara sirgûna ber bi kanên komirê yên li welatê Qazakistanê vekir. Li warekî reş û qîr, li welatekî sik î sar dest pê kir û heta îro didomîne serpêhatiya wî ya li dinê.Temenê wî yê dirêj îsal bû 87. Hepo pola yekem a dibistanê sê caran û bi sê zimanan xwend... ***Samî Hêzil / R.5***



## Ji min gotin

Di dem û dewranên berê de, qewmê qedîm, xwedî zagon û dil birehm...Yek ji wan zagonên vî qewmî, di derheqê rêbertiya wan de ye: Ev qewmê qedîm û dil birehm, ji çend salan carekê ji nav xwe rêberekî hildibijêrin û ji wî re wiha dibêjin; ji îro pê ve tu rêberê meyî... ***Farûqê Feroyî / R.11***




# xwebûn


19-25 NÎSAN 2021 HEJMAR: 70 BUHA: 5 TL rojname@xwebun.org


# Hîmê pêşîn ê rojnamegeriya kurdî

Yekem rojnameya kurdî Kurdistan, di 22'yê Nîsana 1898'an de li Qahîreya Misirê bi pêşengiya Mîqdat Mîthad Bedirxan dest bi weşana xwe kiriye. Bi giştî 31 hejmar der çûye. Em ji bo 123'yemîn salvegera rojnameya Kurdistanê bi rojnameger Mirazê Cemal re axivîn û Cemal wiha got: "Rojnameya Kurdistanê, kevirê pêşîn ê hîmê rojnamegeriya kurdî ye... ***Rêdûr Dijle / R.4***

## Jin çîrokparêzên bîranînê ne

Mijara 'bîra kolektîf' û wateya wê ya der barê avakirina nasnameya kesan û kolektîf de di lêkolînên li ser 'bîr/bîranînê' de bi roleke girîng radibe. Lêkolînên der barê 'bîra kolektîf' de bi taybetî piştî şerê cîhanê yê duyemîn, li ser xebatên trawmayên gelê cihû, rê û rêbazên rizgariya ji trawmayê û stratejiya li dijî jibîrkirinê hatin bipêşxistin. Teorîsyenên 'bîra kolektîf' Jan û Aleîda Assmann di nivîsên xwe de bi taybetî li ser rola bîra kolektîf -di avakirina nasnameyeke nû de- disekinin. Ligel lêkolînên der barê 'bîra kolektîf' ku ji zû ve ye mijara lêkolînan e, têkiliya navbera 'bîr' û 'zayend'ê hîn nû tê lêkolînkirin. Dîsa nivîskar û lêkolînerên femînîst di vê mijarê de rexneya xwe ya esasî li ser dîroknivîsiyê dikin û dibêjin çawa ku dîroka nivîsandî dîroka mêran temsîl dike, jin û nirxên ku jin ava kirine, ji dîroka nivîskî... ***Munewer Azîzoglu Bazan / R.2***




## Segwer (Reyîn) û wêjeya rexneyî

Di wêjeya kurdî de roman, piştî salên 1980'yî gihîştiye asteke baş. Bi taybetî jî romanên kurdiya soranî, asta vê pêşketinê diyar dikin. Yek ji wan romanên hêja jî romana Mihemed Mukrî ya bi navê "Segwer (Reyîn)" e. Ev roman di sala 1982'yan de hatiye çapkirin. Di 2015'an de, ji soranî bo kurmancî, ji aliyê Besam Mistefa ve hatiye latînîze û adapte kirin. Me wek Koma Xwendinê ya Amedê, di 11'ê meha nîsana 2021'ê de nirxand. Roman bîranînên kesek li ber sêdarkê ye. Dem, wek 24 saetên dawîn ên jiyana serleheng hatiye diyarkirin. Şêweyê vegêranê xîtaba bi kesê duyem re ye... ***Ahmed Kanî / R.5***

## Nasname û vîna xwedayî

Meha remezanê di çanda Îslamê de wekî meheke pîroz tê pênasekirin. Bi wateyeke din meha xwe ji guneh û heramiyan paqijkirinê ye. Ango qonaxeke empatiyê, hewla fêmkirina kesên beramber, li beramber afirînerê mezin û pîroz platformeke rexnedayînê ye ji bo hemû bawermendan. Hemû rêûresmên wekî rojî, nimêj, fitir, zekat û hecê bi vê armancê tên kirin. Ango xeletî û nebesiyên xwe bi rêya başiyan dayîna lêborîn û xwe di warê manewî de pak û paqijkirin armanca van rêûresman e. Li gorî baweriya ola îslamê tu mirov ji ber nijad û neteweya xwe... ***Reyhan Îke / R.8***



# Li aliyekî grev li aliyê din kampanya

Tecrîda giran a li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan dewam dike û girtiyên siyasî bi armanca rakirina tecrîdê û bidawîkirina zextên li girtîgehan dest bi greva birçîbûnê kirin û grev didome. Greva bi dehan girtîgehan hatiye destpêkirin zêdetirî 140 roj in dewam dike. Nûnerê TÎHV'ê Umît Efe têkildarî grevê axivî û wiha got: "Greva birçîbûnê li hemû girtîgehan belav bûye. Ev çalakiyek pir mezin e. Em hewl didin greva birçîbûnê bişopînin. Divê daxwazên girtiyan bên qebûlkirin." Her wiha di qada navneteweyî de ji bo azadiya Ocalan kampanya hatin destpêkirin. Li Almanyayê jî hejmara saziyên ku piştgiriyê didin kampanyayê zêde dibe. Herî dawî 17 rêxistinan daxuyanî dan û tevlî kampanyayê bûn... ***R.3***

MAHÎR UZMEZ

## Şarê Kurd veraroçê xo vîneno... *R.9*

## Xoserîya cinîyan xoserîya komelî ya

Nê hewteyanê peyênan de operasyonî cinîyan ser o varayî. Cinîyî şefeqan de yan keyeyanê xo de yan zî kargehanê xo de ameyî tepîştiş. Nê cinîyî zanayêne yenî girewtiş. Girewtişê înan heqdarîyê înan ra ameyêne. Merdimî heqanê xo wina lez ferq nêkenî. Qijitîya xo ra heta piltîya xo, hewnê xo ra heta hayebîyayîşî xo ra ewnîyeno. Vernîya xo ra heta peynîya xo ewnîyeno. Bê zerrî û bi zorî çi kerd o wext zaneno ke çîye xirabî virazîyayo. Çiyo ke kes bê zerrî bikero o çî neheqtî ya. Merdimî yan neheqtî qebul bikerî yan zî semedê heqanê xo sere wedarnî... ***Cemîle Turhalli / R.9***

## Siyaseta înkarê

Ji her alî ve êrîşên dijwar li ser Kurdistanê û îradeya wê ya siyasî hene. Armanca êrîşan tunekirina destkeftiyên gelê kurd in, li herêmê bi pêşengiya dewleta tirk û alîgirê wê ve tên rêxistinkirin û birêvebirin. Her kesê kurd û bi baweriya kurdayetiyê tevdigere li hemberî van êrîşan dibe xwedî bertek ango dibe xwedî helwest. Ev êrîş bi serdegirtina çend şaredarî yan jî bi girtina çend siyasetmedarên kurd ve ne sînordar e, berovajiyê wê ev êrîş li çar parçeyên Kurdistanê... ***Felemez Ulug / R.6***




## Her edaletê dixwazin

Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar zêdetirî 40 roj in li ber Edliyeya Rihayê çalakiya 'edaletê' li dar dixin. Parêzerê malbatê bertek nîşanî bêedaletiyê da û krokiya kargeha bûyer lê çêbûye xêz kir... ***R.3***

## 128 milyar dolar li ku ye?

Di navbera sala 2019'an û 2020'î de, ji rezerva Bankaya Navendî ya Tirkiyeyê 128 milyar dolar pere bi awayekî veşartî û nezelal hat firotin. Bi pandemiyê re heriya ku Tirkiye ketibûyê bêtir xuya bû. Muxalefetê îdia kir ku di dema wezaretiya Berat Albayrak de 128 milyar dolarên Tirkiyeyê hatiye firotin. Piştî ku Albayrak di 8 mijdara 2020'î de, ji karê wezaretiyê îstîfa kir, gumanên der barî xerckirin û firotina rezervên dovîzan de, zêdetir bûn. Di pêvajoya îstîfakirina Albayrak de, Nacî Agbal wekî serokê Bankaya Navendî hat erkdarkirin, lê di meha Adarê de ji serokt iyê hat dûrxistin. Hat îdiakirin ku Agbal derbarî rezervên wenda de lêpirsîn dabû destpêkirin û ev yek jî bû sedemê dûrxistina wî ya ji serokatiyê. Partiyên muxalefetê her ku mijarê tînin rojevê hikûmet hewl dide mijarê binixumîne... ***R.7***

# Muxalefeta herî birêxistinkirî jin in



Adar Şaman

**Jin, bi hêza xwe dizanin, lewma gavên gelekî bi xwe bawer diavêjin. Jin, êdî xwe, dîroka xwe, hêza xwe baş dinasin. Ya ku desthilatdariyê dihejîne, aqilê jinan, rêxistina jinan, edaleta wan e ku a di asta cîhanê de her diçe dibe hêza hêviya çareseriyê**

Têkoşîna jinan ji warê zîhnî, bîrdozî, hizirî, felsefîk û ruhî ve li hember desthilatdariyê muxelefeta herî birexistinkirî û şêwazek nû, veguhertina hevsengî û hêza yekgirtî ya baweriyê ye. Sekna jinan, rêya têkoşîna civakî, zayendî, hêz û wêrektiya muxelefetê bi pêş dixe. Jin, di hêla parastina mafên xwe de her roj bi êrîşan re rû bi rû tên, gavan bi paş de navêje; her ku êrîş zêde dibin, jin jî bi gavên bi xwe bawer ber bi azadiyê ve diherikin. Muxelefeta herî zêde pergala desthilatdariyê dixe nav tirs û xofê de, xwedî helwest, alternatîf disekine, tevgera jinên kurd e.

Kes, tevger, sazî-komele û aqilê muxelif ji her hêlê ve dibin armanca desthilatdariyê. Kesên xwedî helwest, têkoşer, zana, rewşenbîr û bi hêza civakî radibin, ew kes in ku hêza alternatîfa çareseriya pirsgirêkên civakî di pêşketina demokrasiyê de dibînin. Çanda demokrasiyê, asta pêşketina civakî diyar dike, desthilatdariyê lawaz û temen kurt dike. Desthilatdarî, kesên ji bo xwe tehlûke dibîne, bi her şêweyî dixwaze wan kesan tune bihesibînê û tesfiye bike. Hêza civakî ya herî pêşeng têkoşîna jinan a li hember desthilatdarî, koletî û kedxwariyê ye. Tirsa deshilatdariyê ya ji têkoşîna jinan; di esasê xwe de ji civakbûyîna jinan tê. Ji ber ku jin civakê temsîl dike, ango civak bixwe jin e; tirs ji vê hêza civakî ye. Jin, mêzîna edaleta civakî û temsîla wezna nirxên dîrokî ye. Yên ku pişta xwe didin hêza xwe, dikarin bibin pêşengê civakê. Jinên kurd, ji çavkaniya dîroka têkoşînê ezmûnên mezin wergirtine; lewra di têkoşîna demorasiyê de pêşengiyê dike. Ezmûn xemla têkoşîna bi hezaran salan e. Mîras, bingeha bîra mirov û dîrokê bixwe ye.

Her ku jinên kurd, di têkoşîna zayendî, neteweyî û civakî de pêş dikeve ew çendî desthilatdarî biçûk dibe. Devera ku têkoşîn lê hebe, li wir serweriya zilam lawaz e, hêza jinan a civakî li pêş e. Ya ku sînorê cîhana pergala patriarkal teng dike, biryara jinan a têkoşînê ya jêveneger e. Jin, bi rastiya xwe hesiyane, bi koletiya bi hezarên salan dizanin ku weke qedera wan hatibû pênasekirin. Îro li hember vê qederê radibe, zincîran diqetîne û lanetê lê tînê. Li hemberî qedera lê hatiye ferzkirin serî radike û dixwaze qedera xwe bi xwe tayîn bike. Jin, bi hêza xwe ya cewherî dizanin, lewma gavên gelekî bi xwe bawer diavêjin. Jin, êdî xwe, dîroka xwe, **hêza xwe baş dinase. Ya ku desthilatdariyê dihejîne, aqilê jinan, rêxistina jinan, edaleta wê ya di asta cîhanê de her ku diçe dibe hêza hêviya çareseriyê ye.**

Desthilatdarî her çendî biçûk dibe, êrîşî jin û nirxên wê dike. Bi êrîşan dixwaze xwe li ser desthilatdariyê bigire û temenê xwe hinekî din dirêj bike. Di pêvajoyên tevlihev-kaosê de edalet ji holê tê rakirin, dizî, kuştin, revandina mirovên muxalif, destavêtina jinan, girtin, îşkence û tecrîd hîn girantir û kambaxtir dibe. Ev mijarên me hejmartî, îro li Tirkiyeyê bûne kiryarên gelekî ji rêzê. Desthilatdarî naxwaze jiyan aram, xweş û geş bibe. Her dixwaze alozî û bêîstikrarî hebe da ku civak hewceyî wê bibe.

Deshilatdarî, dixwaze destkeftiyên jinan bi destwerdanên hişmendiyeke eletewş yek bi yek ji holê rake. Bi tirsonekî di nîvê şevê de zilamek radibe û dibêje 'Peymana Stenbolê nas nakim' û peymanê fes dike. Ev destkeftî bi ked û berdêlên jinan hatibû avakirin. Destkeftiyên jinan, di vê demê de bi zanebûn dibin mijara destwerdan û nîqaşan. Ev yek wisa ne gengaz e, ne jî ji rêzê ye ku bibin mijara berjewendiyên polîtîkayên desthilatdariyê. Dema ku jin li dijî van polîkayên destwerdanê serî radikin, an tên girtin an jî tên kuştin… Wê jin bi têkoşîna xwe li dijî van polîtîkayên tunehesibandinê li ber xwe bidin û serî netewînin. Jin, ji her demê bêhtir bi biryar in ku 'xwe biparêzin', birêxistin bikin û destkeftiyên xwe mezin bikin. Ji ber ku ew nirx, encamên têkoşîna jinan ên bi salan e. Ew nirx, berdela bi hezaran jinan in ku hatin kuştin û kujerê wan nehatin cezakirin, li ser bîranîna wan jinan, encama têkoşîna tevahî jinan e.

Her çendî demokrasî bi pêş bikeve civakbûn jî ew çendî mezin û bi gewde dibe. Deshilatdarî, kelemê herî mezin ê li pêş demokrasiyê, civakbûn û azadiyê ye. Xwe bi xwe birêvebirin mafê jin û civakê ye. Jin, aramiyê di azadî û demokrasiyê de dibînin. Mezinbûna demokrasiyê, biçûkbûna desthilatdarî û kedxwariyê ye. Wê jin, serî li hember destwerdanên rejîma mêr-dewletê netewînin û dê her deverê bikin qada hesabpirsîn û berxwedanê.






Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

## Jin çîrokparêzên bîranînê ne

Mijara 'bîra kolektîf' û wateya wê ya der barê avakirina nasnameya kesan û kolektîf de di lêkolînên li ser 'bîr/bîranînê' de bi roleke girîng radibin. Lêkolînên der barê 'bîra kolektîf' de bi taybetî piştî şerê cîhanê ya duyemîn, li ser xebatên trawmayên gelê cihû, rê û rêbazên rizgariya ji trawmayê û stratejiya li dijî jibîrkirinê hatin bipêşxistin. Teorîsyenên 'bîra kolektîf' Jan û Aleîda Assmann di nivîsên xwe de bi taybetî li ser rola bîra kolektîf -di avakirina nasnameyeke nû de- disekinin. Di vê çarçoveyê de behsa du awayên 'bîra kolektîf' dikin: Yek jê 'bîra danûstandinê (communicative)' û ya din jî 'bîra çandî (culturel)' ye.

Li gorî Assmann, bîra danûstandinê nêzîkî 80 salan / bi veguhaztina devkî herî zêde bi 3 nifşan ve sînordar e. Di pêvajoya bîra danûstandinê de, ku wekî teşeyeke 'bîra kolektîf a rojane' tê pênasekirin, serpêhatiyên kesane yên biyografîk navendî ye. Ji ber vê yekê, ew nêzîkî jiyana rojane ye, nefermî ye û bi hin mijar û kesên taybet ve girêdayî ye. Ev tê vê wateyê ku metirsiya jibîrkirinê tê de heye. Ligel bîra danûstandinê, li ser paşerojeke nêz jî disekine, bîra çandî paşeroja dûr di nav xwe de dihewîne. Xalên wê yên qewîn hene. Bûyerên dîrokî yên bandora xwe li ser civakan, gelan û koman kirine û bîranînên wan bi awayên çandî (nivîskî, rîtuel, bîrdarî) û sazîkirinên ragihandî (xwendin, lêkolînkirin û hwd.) hişyar tên hiştin, wek bîrên çandî tên binavkirin. Bîra çandî xwedî sê lingan e: bîranîn, çand û kom. Ev her sê ling di avakirina nasnameyên kesane û kolektîf de bandorên mezin dikin. Ango kes/gel/kom 'wekhev' û 'cudahî'ya xwe li gorî van bîranînan pênase dikin û li ser van bîranînên çandî roja xwe ya îro ava dikin.

Ligel lêkolînên der barê 'bîra kolektîf' ku ji zû ve ye mijara lêkolînan e, têkiliya navbera 'bîr' û 'zayend'ê hîn nû tê lêkolînkirin. Dîsa nivîskar û lêkolînerên femînîst di vê mijarê de rexneya xwe ya esasî li ser dîroknivîsiyê dikin û dibêjin çawa ku dîroka nivîsandî dîroka mêran temsîl dike, jin û nirxên ku jin ava kirine, ji dîroka nivîskî û heta devkî hatine qewitandin, ev heman tişt ji bo bîra kolektîf jî derbasdar e. Ango jin ji bîranînên kolektîf ku nasnameyê ava dike, hatine dûrxistin û ev tunedîtin jî bûye sedem ku jinbûn wek bênirxbûn tê hesibandin. Heta li dijî vê tunedîtina jinan di bîra kolektîf de femînîst Odile Jansen dibêje "di rastiyê de jin çîrokparêzên bîranînê ne. Ne ji ber sedemên genetîk an jî biyolojîk. Lê ji ber awayê perwerde û gihandina wan, ku berpirsiyariya lênêrîna (care) kesên din û jiyanê di xwe de dibînin." Ango dîsa dabeşkirina peywîrên di navbera jin û mêran ku jinê ji bo xwedîkirina mal û zarokan û mêr ji bo kar û barên derve berpirsiyar dibîne, wek sedem tê nîşandan.


Dîsa Aleida Assman balê dikişîne têkiliya navbera 'bîranîn û jibîrkirin'ê û têkiliya wan a ser zayendên mêr û jin. Ew li gorî lêkolînên xwe yên tekstên wêjeyî dibêje ku 'bîranîn bi jinê' û 'jibîrkirin bi mêrê' tê pênasekirin. Li gorî wê jin dibin kirdeyên bibîranînê (Jin mêrî bi bîr tîne) û bireserên jibîrkirinê (Mêr jinê ji bîr dike). Li dijî vê mêr dibin kirdeyê jibîrkirinê (Mêr jinê ji bîr dike), lê dibin bireserên bibîranînê (Jin mêrî bi bîr tîne). Assman behsa çend awayên der barê jibîrkirin û bîranînê dike: Wek mînak di nivîsên Shakespeare de jin şahidên kiryarên mêran in. Bi vegotina şîn, êş û giliyê dibin temsîla zindî ya rabirdûyê. Dîsa Nîetzsche di nivîsên xwe de mêran wek kiryarên karên girîng û ji ber vê yekê jî jibîrker pênase dike. Îdia dike ku mêr tenê bîranînên girîng û pêwîst di hişê xwe de dihêlin û ev yek jî qaşo ji xurtbûna wan tê û ligel vê, bîranînê ku "mirovan lawaz dike û astengiyê derdixîne", bi jinbûnê ve girê dide. Di romanên Oscar Wilde de jî rewş naguhere. Wexta mêr di romanên wî de li pêşerojê dinêrin, jin di nav bîranîn û paşerojê de xwe winda dikin. Wekî ku di kurdî de jî tê gotin "ê ku bû, nede dû" di romanên Oscar Wilde de ji mêran re tê saloxkirin. Li gorî Assman ev stratejiya jibîrkirinê ji bo ku mirov ji êş û gunehkariya xwe û ji bo ku ji encamên kiryarên xwe dûr bikeve, tê bikaranîn. Herî dawî bi mînaka 'şer û şîn' ev têkiliya tevlihev bi awayekî zelal radixîne ber çavan: Dabeşkirina tûj a navbera zayendan û rolên wan ên çendî ku mêr wekî kiryarên şer û girêdayî vê dîrokî, û jinan sembola xemgîniyê û şînê dibînê, di mînakên hemû şer û pevçûnan de derdikeve pêş.

Di van hemû nîqaşan de pirsên ku derdikevin pêş, ev in: "Kî bi bîr tîne û kî tê bibîranîn?" Ango yên ku mayînde dike û mayînde dibe kî ne? Yek ji helwesta girîng a femînîzmê ew e ku ji bilî bicihkirina jinan di warê nivîsê de, di heman demê de di tecrûbeyên wan ên jiyanê de nexuyakirina wan, xwezahîbûna wan û 'bêdawîbûn'a wan bi dîrokê ve girêdayî şîrove kirin û rê li gihandina tecrûbeyên wan ên dîrokê vekirine. Lewre hat dîtin ku jin hem dîrokê de hem jî di bîranîna mirovahiyê de kêm tên dîtin û vegotin. Serpêhatiyên wan ji bo veşartin û parastinê xwedî qîmet nehatin dîtin. Lê ligel vê vegotinên wan ên li ser bûyer û kiryarên mêran ku dîsa ji bo jinan ne destkeftîbûnek e, tê dîtin. Lewma ye ku jin niha têkoşîna vegotin û aşkerekirina serpêhatiyên xwe dikin. Ev yek dê reng û naveroka bîra kolektîf a mirovahiyê biguherîne.

# Banga ji bo greva birçîbûnê

Navenda Nûçeyan

**Tecrîda giran a li ser Ocalan dewam dike û girtiyên siyasî bi armanca rakirina tecrîdê dest bi greva birçîbûnê kirin û grev didome. Her wiha di qada navneteweyî de ji bo azadiya Ocalan kampanya hatin destpêkirin û herî dawî 17 rêxistinan piştgirî da kampanyayê**



Girtiyên siyasî yên ji doza PKK û PAJK'ê girtî ne, di 27'ê mijdara 2020'an de, bi armanca bidawîkirina tecrîda li ser Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan ku 22 sal in li Girtîgeha Îmraliyê ya Tîpa F a Ewlehiya Bilind girtî ye û binpêkirinên mafên mirovan ên li girtîgehan zêde bûne, dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bidorveger kirin. Çalakiya greva birçîbûnê ku koma 29'emîn dewr girt, zêdetirî 140 roj in dewam dike. Çalakiya li Mexmûrê zêdetirî 120 roj in û ya li Yewnenistanê jî zêdetirî 100 roj in dewam dikin.

Bi pêşengiya HDP'a Amedê ji bo balê bikişînin ser çalakiya greva birçîbûnê li ber Bîrdariya Mafên Mirovan a Parka Koşûyolû ya Navçeya Rêzan a Amedê daxuyaniya çapmeniyê hat dayîn. Hevserokê HDP'ê yê Amedê Zeyat Ceylan, aktîvîstên Tevgera Jinên Azad (TJA), rêveberên bajêr û navçeyan ên HDP'ê, endam û rêveberên TUAY-DER'ê û welatî beşdarî daxuyaniyê bûn.

Polîsan berî daxuyaniyê Bîrdariya Mafê Mirovan dorpêç kirin. Gelek maşîneyên zirxî û polîs li derdora parkê bi cih bûn. Ketin û derketina bîrdariyê hatin girtin. Berî daxuyaniyê Kontrola Agahiya Giştî (GBT) hat kirin. Kesên beşdarî daxuyaniyê bûn xistin çemberê.

Polîsan nehişt daxuyanî bê dayîn û beşdarên çalakiyê bertek nîşan da û dest bi çalakiya rûniştinê kirin. Di çalakiya rûniştinê de, bi tilîlî û çepikan dirûşma "Bijî berxwedana zindanan" hat berzkirin. Bi vî awayî bertek nîşanî tecrîdê dan û xwedî li çalakiya greva birçîbûnê derketin.

**Banga koordînasyonê**

Bi armanca şopandina çalakiyên greva birçîbûnê ya di girtîgehên herêma Marmarayê de, Koordînasyona Marmara ya Şopandina Greva Birçîbûnê hatibû avakirin. Ji Hevparên koordînasyonê Nûnerê Weqfa Mafên Mirovan a Tirkiyeyê (TÎHV) a Stenbolê Umît Efe û Hevserokê Komeleya Piştevaniya Bi Malbatên Girtî û Hikumxaran a Marmara (MATUHAY-DER) Nesîm Ozkan, têkildarî bandorên tecrîdê yên li ser civakê û greva birçûbûnê axivîn.

Nûnerê TÎHV'ê Umît Efe diyar kir ku tecrîd konsepta tundiyê ya kapîtalîzmê ye ku di girtîgehan de tê birêvebirin û wiha axivî: "Girtîgeha li gorî mantiqa ku ji aliyê navendekê bi tenê bê birêvebirin hatine avakirin. Pêkanîna tecrîdê, di serdemên modern de li Awropa, Amerîqa û Amerîkaya Latîn, li dijî muxalifan hatiye bikaranîn. Li tevahiya cîhanê, girtî li dijî pergala tecrîdê derdikevin. Tecrîd, li gelek cihan dibe sedema rijadina xwînê. Tecrîd rabezeke îşkenceyê ye. Bi tecrîdê tê xwestin ku danûstandinên bedenî, hestiyarî û têgînên kesan bixin asta herî kêm. Bi vê jî pêvajoya teslîmgirtinê û tunekirinê hedef digirin. Ji ber vê yekê weke psîko-teror tê pênasekirin. Tecrîd bandora pir mezin li ser mirovan dihêle. Bi tecrîdê hevgirtina ruhî, civakî û bedenî dibin hedefa gefên mezin."

Der barê greva birçîbûnê de jî Efe ev nirxandin kir: "Greva birçîbûnê li hemû girtîgehan belav bûye. Ev çalakiyek pir mezin e. Em hewl didin greva birçîbûnê bişopînin. 130 roj in girtî di greva birçîbûnê de ne. Ev ji bo bedena girtiyan ne baş e. Divê daxwazên girtiyan bên qebûlkirin. Lazim e ku di çarçoveya mafên mirovan de, diyalog bê pêşxistin. Li vî welatê gelek rewşên biêş hatin jiyîn. Divê dev ji tecrîdê bê berdan. Bi pêvajoya pandemiyê re tecrîd kûrtir bû. Girtî tenê mafên xwe yên hiqûqî û mirovî yên bingehîn dixwazin. Dîsa hejmara girtiyên nexweş her roj zêde dibe. Ev girtî di şert û mercên dijwar de tên girtin. Pêwîst e ku mafê wan ê başbûnê neyê astengkirin. Em qîrîna wan a bilind dibe dibihîzin. Niha qîrîniyek bilind dibe. Berî ku encam xirabtir bibe, divê em vê qîrîniyê bidin bihîstin."

## Piştgiriya ji bo kampanyayê zêde dibe

Di qada navneteweyî de ji bo azadiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan kampanyayên nû tên destpêkirin. Koma Xebatê ya Kurd a Afrîkaya Başûr (KHRAG) û Konfederasyona Sendîkayên Afrîkaya Başûr (COSATU) ji bo azadiya Rêberê PKK'ê Abdullah Ocalan, di 11'ê çileya 2021'ê de, dest bi kampanyaya "Dem hatiye: Li Tirkiyeyê Ji Bo Aştiyeke Adilane Ji Abdullah Ocalan Re Azadî" kirin.

Di çarçoveya kampanyayê de, ku tê xwestin Neteweyên Yekbûyî (NY) di vê mijarê de bikeve nav liv û tevgerê, ji Sekreterê Giştî yê Neteweyên Yekbûyî Antonio Guterres re name hatin nivîsandin. Di nameyan de hate ragihandin ku li dijî tecrîda girankirî ya li Îmraliyê divê Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê ya Neteweyên Yekbûyî (CAT) û Komîteya Pêşîgirtina li Îşkenceyê ya Ewropayê (CPT) bi rengekî lezgîn bikevin nav liv û tevgerê. Li Almanyayê jî hejmara saziyên ku piştgiriyê didin kampanyayê zêde dibe. Herî dawî 17 rêxistinan daxuyanî da û tev li kampanyayê bûn.

# Parêzerê malbatê îdiayên dozger pûç kir

Beriya hilbijartinên 24'ê hezîrana 2018'an de parêzvan û xizmên malbata parlamentere AKP'ê Îbrahîm Halîl Yildiz li Pirsûsê êrîşî malbata Şenyaşar kirin û di encamê de Haci Eshed Şenşayar, Adil Şenyaşar û Celal Şenyaşar hatibûn kuştin. Ji malbata Yildiz jî Mehmet Şah Yildiz hatibû kuştin.

Emîne Şenyaşar û kurê wê Ferît Şenyaşar zêdetirî 40 roj in li ber Edliyeya Rihayê çalakiya 'edaletê' li dar dixin. Parêzerê malbata Şenyaşar endamê Komeleya Hiqûqnasên Ji Bo Azadiyê (OHD) Bulent Dûran, krokiya kargeha bûyer lê çêbûbû xêz kiriye û bûyer bi her awayî vekolaye.

Parêzer Dûran anî ziman ku gava mirov li krokiyê mêze dike, derdikeve holê ku fîşekên dixin stûyê Fadil Şenyaşar, li gor pozîsyonê ne mimkun e ku aydê wî bin û got: "Gava em li krokiyê dinêrin, 5 derb bera gûzeka Adil Şenyaşar dane. Îbrahîm Yildiz, 6 derb berdane û Enver Yildiz jî 3 derb berdane. Bi giştî 14-15 fîşek hene. Gava em li vê krokiyê dinêrin, em dibînin ku Fadil jî du derb berdane. Lê 12 derban dixin stûyê Fadil. Li nuqteya 20, 21, 22 9 fîşekan dixin stûyê Fadil."

Dûran bi bîr xist ku di vekolîna ewil a cihê bûyerê de tê gotin ji 17 fîşekên hatine teqandin 7 jê yên polîsan e û wiha got: "Lê em nizanin polîsan bera ku derê daye. Der barê vê de tu dîmen tune ne. Fadil Şenyaşar, tenê 3 derban berdide. Li devera ku ber didê jî birayê wî Ferît Şenyaşar heye û li wir Kenan û Suleyman Yildiz lê dixin. Abdûrrahman Yildiz û Mûstafa Yildiz jî li ber wan sekinandî ne. Ew, her sê derban di vê kêliyê de berdide. Tenê van fîşekan berdide. Lê di biryarê de tê gotin Fadil Şenyaşar Mehmet Şah Yildiz kuştiye, Abdûrrahman, Kenan, Suleyman, Nîhat û Mûstafa Yildiz jî birîndar kiriye. Her wiha îdia dikin ku Fadil bera milê xwe daye. Sirf ji bo ceza li Fadil Şenyaşar bê birîn, tiştên nehiqûqî tên kirin."

Dûran destnîşan kir ku cezayê ji ber kuştina mirovan li Fadil Şenyaşar hatiye birîn ne rast e û got: "Tu dîmenek tune ye ku rasterast Mehmet Şah Yildiz hedef girtiye û ew kuştiye. Lewma nayê qebûlkirin ku ev li Fadil Şenyaşar bê barkirin. Dê ev yek çawa bihata tespîtkirin? Tenê li balastîkê. Ji bo vê jî çek divên. Sedema ku ev nayên tespîtkirin jî, Mehmet Şîmşek radihêje çeka Fadil Şenaşar. Paşê jî dibêje, 'winda bûye. Sedemek vê heye. Heger balastîka van fîşekan bihata kirin, dê derketa holê ku Fadil Şenyaşar ev qas fîşek bernedane û wê derketa holê ku Fadil Şenyaşar qesda kuştina Nîhat, Abdûrrahman, Suleyman Yildiz nekiriye."

Dûran, destnîşan kir ku fîşekên ku niha li Fadil Şenyaşar tên barkirin, yek jê jî bi destê wî nehatine teqandin û got: "Em ferz bikin berdaye. Ev xweparastin e. Yanî em dibînin ku Adil Şenyaşar bi giranî birîndar bûye. Ji dêvla fîşekên di canê wî de bên tespîtkirin, radibin birîndariya hemû kesên li wir dixin stûyê Fadil Şenyaşar û ceza lê dibirin. Ev li dijî hiqûqê ye." Dûran, da zanîn ku dadgeh xwestiye rojek berî rojekê dosyeyê biqedîne û got: "Dadgehê ji bo zûzûka dosyeyê ji stûyê xwe derxe biryar da û ev ceza li Fadil Şenyaşar birî. Ev ceza nayê qebûlkirin. Gelek şahid û gelek dîmen hene. Ji malbata Yildiz kesek jî nehat binçavkirin. Ev jî nîşan dide ku bê hêza desthilatê çawa tê bikaranîn." ***RIHA***

## Zêdetirî 3 milyon kes mirin

Li seranserê cîhanê ji ber nexweşiya koronayê hejmara kesên ku mirin ji 3 milyonî derbast kir. Li Ewropayê jî hejmara nexweşiyên koronayê ji milyonekê derbas kir. Li gorî daneyên Zanîngeha Hopkinsê ji ber nexweşiya Covîd-19'ê ango koronayê li cîhanê zêdetirî 3 milyon kes mirin. Hat gotin ku nexweşî herî zêde parzemîna Amerîkayê peyda bûye. Mirin herî zêde li DYA, Brezîlya û Meksîkayê çêbûne û li her sê welatan bi giştî milyonek û 100 hezar kes mirine. Dîrektorê Rêxistina Tenduristiyê ya Cîhanê yê Ewropayê Hans Kluge diyar kir ku li gel peydakirina aşiyê hêj nexweşî dewam dike. Li gorî daneyên fermî heta niha li Tirkiyeyê bi giştî 4 milyon û 86 û 957 kes bi nexweşiya koronayê ketine û bi giştî 35 hezar û 31 kes mirine. Bi hatina rojiya remezanê li Tirkiyeyê qedexe dest pê kir û lê ev qedexe bûn mijara rexneyan. Di van rojên dawîn de li Kurdistanê jî hejmara kesên nexweşiya koronayê dikevin û jiyana xwe ji dest didin zêde dibin. ***AMED***

## Aktivîsta îranî rastî êrîşê hat

Li Stenbolê ji ber parvekirinên wê yên medya civakî, 4 kesan êrîşî aktîvîsta îranî Nasîbe Şemasî kiribû. Ji wê rojê ve agahî ji Nasîbe ne hatibû girtin. Aktîvîsta mafê jinên Îranê Nasîbe Şemsaî, li dijî pêkanîna çarika mecbûrî, di sala 2017'an de, bi hinceta ku beşdarî "Çalakiya Çarşema Spî" bûye 12 sal cezayê girtîgehê lê hatibû birin. Nasîbe Şemsaî ji ber cezayê girtîgehê, neçar dimîne ku bireve Tirkiyeyê. Şemsaî li Tirkiyeyê jî rastî êrişa 4 kesên ku nasnameya wan ne diyar e. Parêzerê Şemsaî Kûrtûlûş Baştimar, der barê rewşa Şemsaî de wiha got: "Di serî de me tu agahî ji muwekîla xwe negirt. pişt re me me ji Şemşaî agahî girt û dît ku polîsan ji bo îfadeyê wê birine.Em vê êrîşê qebûl nakin û serî li rêyên qanûnî bidin." ***AMED***

## Êrîşî balafirgeh û leşkerên tirk kirin

Bi balafirên bêmirov li dijî balafirgeha Hewlêrê ya navneteweyî ku navenda hêzên Amerîka û Hevpeymanan lê ye, êrîşek bi mûşekan pêk hat. Her wiha navendek leşkerên tirk li nêzî Başiqayê jî rastî êrîşa bi mûşekan hat û leşkerek hat kuştin. Dengê teqînek mezin ji Balafirgeha Hewlêrê ya Navneteweyî hat bihîstin. Piştî demek kurt, hat gotin ku êrîşek bi balafirên bêmirov pêk hatiye. Di êrîşê de navendek leşkerî ya hêzên Amerîka û hevpeymanan hat hedefgirtin. Li gorî zanyariyan li derveyî ziyanên madî ti ziyanek canî çênebûye. Wezareta Hundirîn a Herêma Federal a Kurdistanê jî der barê êrîşê de got, êrîş bi balafireke bêmirov pêk hatiye. Hemwextê êrîşa li Hewlêrê li nahiya Zîlkan a ser bi navçeya Şêxan a Duhokê ku nêzî Başiqayê ye, bi sê mûşekan êrîşî navendeke leşkerên tirk hat kirin. Li gorî agahiyan du mûşek li navenda leşkerên tirk ketine, leşkerek tirk miriye û mûşekek jî li gundê Gudad ketiye. Di encama wê de jî zaroka temen 12 salî ya bi navê Faêze ya ji gundê Gudad birîndar bûye û wê rakirine nexweşxaneyê. Hêjayî bibîrxistinê ye di 15'ê sibata 2021'ê de jî bi mûşekan êrîşê Balafirxaneya Hewlêrê hatibû kirin. Hinek mûşek li nav taxên Hewlêrê jî ketibû. Di encama êrîşa wê demê de jî leşkerekî amerîkî hatibû kuştin û 9 kes jî birîndar bûbûn. ***HEWLÊR***

## ‘EW HÎM Û MAKA ROJNAMEGERIYA KURDÎ YE’

# Rojnameya Kurdistan 123 salî ye

Rêdûr Dîjle

**Li hemberî rojnamegeriya kurdî, kîneke mezin ji wê wextê de heya niha berdewam e, lê kîna wan çi dibe bila bibe ê nikaribe pêşî li ber vê bigirin ji ber ku hîmê pêşîn baş hatiye danîn û gelek tiştên pak û tekûz li ser vî kevirî hatine danîn**





Yekem rojnameya kurdî Kurdistan, di 22'yê Nîsana 1898'an de li Qahîreya Misirê bi pêşengiya Mîqdat Mîthad Bedirxan dest bi weşana xwe kiriye. Bi giştî 31 hejmar der çûye. Weşana xwe bi zimanê kurdî û tirkiya osmanî kiriye.

Kurdistan, rojnameyeke sirgûnê û rojnameyeke muxalif e. Bi her awayî bi sansur û qedexeyên rejîma Osmanî re rû bi rû maye. Ji ber rejîma Siltan Evdilhemîd û polîtîkaya wî ya hişk a li hemberî muxalifan, ji ber hafiye û ajanên wî, xwedanê wê neçar maye berê xwe bide navenda muxalifên wê demê Qahîreyê û vê navendê jê re bike war. Ev yek bixwe jî muxalifiya wê eyan dike û nîşan dide ku ketina wê ya nav sînorên Osmanî qedexe ye. Jixwe ji nameyên xwendevanan ên ji rojnameyê re şandine jî kifş dibe ku bê astengî û zextine çawa li ser wê hene û di şert û mercine çawa de derketiye. Xwendevanên rojnameyê, di nameyên xwe de diyar dikin ku zabit û eskerên Osmanî, wexta rojnameyê bi wan re dibînin ji wan distînin û tahdeyê li wan dikin û wan digirin. Ji xeynî vê Evdilhemîd jî der barê wê de fermanekê derdixe. Di vê fermana xwe de dibêje, gava hecac ji Mekke û Medîneyê bên, wan baş sehî bikin, bila rojnameyê bi xwe re neynin.

Rojnameya Kurdistanê çendî ku bi tahde, sansur û qedexeyan re rû bi rû mabe jî, lê ji ya xwe daneketiye xwar û rêbera wê her heqîqet bûye. Ji bo rojnamegeriya kurdî bûye hîmeke xurt. Bûye mîrateyeke qewî. Ji lew re gava di sala 1908'an de atmsofera siyasî diguhere, gava zext û zorî, sansur û qedexe sist dibin, kesên sirgûnkirî yeko yeko vedigerin û kurd ji nû ve dikevin nav hin hewldanan. Ev hewldan, dibin sedema hin rojname û kovarên nû. Ev rojname û kovar, îlhamê ji wê mîrateya qewî digirin û li ser wê rêça ku rojnameya Kurdistanê vekiribû tevdigerin.

Em ji bo 123'yemîn salvegera Rojnameya Kurdistanê bi çapdar û kedkarê rojnameya Rêya Teze Mirazê Cemal re axivîn. Çendî ku nexweş bû jî, lê ji ber ku mesele rojbûna rojnameya Kurdistanê bû, em neşikandin. Ewilî hinekî ma sekinî û bi dû re bişirî û dawiyê bi sewteke hestbar û zelal got, "Ew heyîna me ye. Ma em dikarin ji heyîna xwe re bêjin na" û daxwaza me qebûl kir.

Mirazê Cemal ku rojnameya Kurdistanê wekî "maka rojnamegeriya kurdî ye Kurdistan" pênase dike, dibêje: "Rojnameya Kurdistanê, di warê çapemeniyê de bandoreke pir xurt û pir mezin li ser fikir û ramana kurdî kiriye."

**Rojeke nû li Kurdistanê hilhat**

Cemal ku bi awayekî fermî 23 sal in di rojnameya Rêya Teze de dixebite, destnîşan dike ku rojnameya Kurdistanê rojnameyeke dîrokî û pêngaveke pêşîn e di warê çapemeniyê de ji bo kurdan û dibêje: "Pêngava pêşîn bû. Eynî wekî rojeke nû li seranserê Kurdistanê, li ser axa Kurdistanê hilê. Ev, ji bo me serbilindî ye. Helbet di zarotî û xortaniya xwe de me der barê wê de hin tişt bihîstibûn, lê em ne wisa pir serwext bûn. Paşê her ku em serwext bûn, li ber dilê me hîn şîrîntir bû. Çimkî, bû hîm, bû rê ji bo gelek rojname û kovarên din."

Cemal, bi lêv dike ku îro ro rojnamegeriya kurdî deyndarê rojnameya Kurdistanê ye, ji lew re di her tiştî de kevirê pêşîn pir girîng e û ew kevir dibe seba berdewamiyê û wêrekiyê. Cemal, diyar dike ku lewma dikare ji bo rojnameya Kurdistanê bibêje "maka rojnamevaniya kurdî ye" û dibêje: "Rojnameya Kurdistanê, kevirê pêşîn ê hîmê rojnamegeriya kurdî ye. Li dû wê bi dehan rojname û kovar derketin. Ez dikarim bibêjim, wekî gelek rojname û weşanên kurdî rojnameya me Rêya Teze jî deyndarê vê rojnameyê ye. Çendî ku Rêya Teze niha 91 salî ye û kal bûbe jî, lê hê jî zaroka rojnameya Kurdistanê ye û ji kaniya wê vexwariye."

**Xwedî rol û helwesteke hebûniyê**

Cemal, destnîşan dike ku Kurdistan, di warê çapemeniyê de bandoreke pir xurt û mezin li kurdan, fikir û ramanên kurdî kiriye û ji ber vê rol û helwesta xwe ya ji bo hebûniyê û li dijî helandinê bi tahdeyên rejîma Osmanî re rû bi rû maye û dibêje: "Dewleta Tirkiyeyê gava Rêya Teze dest bi weşana xwe dike, bi çend salan bi rêyên dîplomatîk ji Sovyetê dixwaze Rêya Teze bigire, berbend bike. Yanî ew zext û zoriyên li ser Kurdistanê û yên berdewama wê hê jî didomin. Em dibînin bê îro li Tirkiyeyê çi tê serê zimanê kurdî, çi tê serê rojnamegerên kurd."

**‘Hîmê pêşîn baş hatiye danîn’**


Cemal, bi lêv dike ji wê çaxê heya niha 123 sal derbas bûne û di ev qas salî de hovîtî û barbariya dewletê ya li hemberî zimanê kurdî û rojnamegeriya kurdî neguheriye, lê rojnamegeriya kurdî gelek merhele derbas kirine û xwe qewîtir kiriye. Cemal dibêje: "Wê wextê jî rojname dihatin qedexekirin. Wê wextê jî rojnameger dihatin nefîkirin û girtin. Lê em niha jî dibînin rojname, televîzyonên kurdan dadidin, berbend dikin. Rojnamegerên kurd tên girtin û tên kuştin. Kîna wan ji wê wextê heya naka berdewam e, li hemberî rojnamegeriya kurdî. Lê kîna wan çi dibe bila bibe, ê nikaribin pêşî li ber vê bigirin. Çimkî kevirê pêşîn, hîmê pêşîn baş hatiye danîn û gelek tiştên pak û têkûz li ser vî kevirî hatine danîn. Ne mimkun e, bê rûxandin.”

**‘Rêke teze vekir’**


Her wiha Mirazê Cemal ku niha hem çapdar, hem nûçevan, hem nivîskar û hem jî belavkarê rojnameya Rêya Teze ye, ji bo Rêya Teze û armanca wê dibêje: "Sovyetê dixwest, bi rêya Rêya Teze îdeologiya komunistiyê li nav xebatkarên kurd belav bibe û ev bi ser ket. Rêya Teze hem di vî warî de hem jî di warê kurdayetiyê de bû neynik. Bû neynika kurdên Ermenistanê, kurdên seranserê Sovyetê. Bi rastî jî rêyeke şoreşgerî bû, di warê çanda kurdî de. Rêke teze vekir.

Mesela ji te re bibêjim, tesîrek wê wisa çêbûbû; gava em zarok bûn, xwendin û nivîsandina me tune bû, lê dîsa jî çavê me li rêya wê bû. Gava post dihat Elegezê, em bi bazdan diçûn pêşiya postê. Wexta rojnameyê dida me, me lê dinêrî. Me bîn dikir. Çimkî bîna kurmancî jê dihat."

Cemal, destnîşan dike ku rojnameya Rêya Teze kurd perwerde kirine û dibêje: "Mîna leşkerekî kurdan kontrol dikir. Hem dibistan bû, hem jî leşker bû. Her tişt bû. Zaroka rojnameya Kurdistan bû. Hevrêya Hawarê bû. Gava hin hejmarên Rêya Teze digihên Celadet Alî Bedirxan, ew jî di hejmara heştan a Hawarê de bi navê Herekol Azîzan ji bo Rêya Teze dibêje; 'Rojnameke kurdmancî, bi herfên nû, bi kurdmanciyeke xwerû, li Rewanê, di şiklekî spehî û çeleng de derdikeve. Vê paşiyê çend hejmarên wê gihîştine destê me. Çavên me pê biruhn bûn, dilê me şa û geş bû. Kurdmancên Rewanê ji rojnamê pêve çend kitêb jî derêxistine. Me sê-çar roj mijûlahiya xwe bi wan kirin. Ji nav rûpelên wan ên taze û têr bêhna kulîlkên Çiyayê Elegezê, bayê zozanên Serhedan dihatin. Di nav resmên wan de şal û şapikê kurdmancî, xencer û piştxencera kal û kalikên me dihatin dîtin. Riya Teze wek navê xwe taze ye, nû ye, nûbar e...’ A ha bi rastî jî zaroka Kurdistanê Rêya Teze ev bû."




## Mirazê Cemal kî ye?



Helbestvan, rojnameger û nivîskar Mirazê Cemal, di sala 1945’an de li gundê Rêya Teze (Qundexsaz) hatiye dinyayê. Malbata wî ji Mûşê çûye Dîgora Qersê û ji wir jî derbasî wî aliyê Çemê Arpaçayê ku milekî Çemê Erezê ye, gundê Rêya Teze bûye. Cemal, ewilî li dibistana gund, a li ser navê ronakbîrê kurd Emînê Evdal xwendiye û paşê çûye li dibistana gundê Elegezê xwendiye. Li Elegezê heya pola dehan xwendiye û ji vir jî çûye bajarê Gumuliyê. Li Gumuliyê bi ermenkî xwendiye û bi hejmara duduyan dibistanê kuta kiriye. Lê gava panzdeh salî bûye dê û bavên wî mirine û ji bêgavî dev ji dibistanê berdaye, ji bo xwişk û birayên xwe xwedî bike. Di zarokatiya xwe de dest bi nivîsandina helbestan kiriye û ji rojnameya Rêya Teze re gotar nivîsîne. Helbestên wî, wê wêxtê belav bûne û bûne stran û di dawet û şahiyan de hatine gotin. Gava dev ji dibistanê berdaye, eşq û hewesa wî ya ji bo xwendinê zêde bûye. Ji bo vê dibêje, “erê min wek kesên din têr dibistan nexwend, lê odeyên kurmanciyê bûn zankoya min.” Li van odeyan tev li şevbuhêrkan bûye û guh li çîrok, destan, helbestan û nîqaşên der barê dîrokê de kiriye. Heya niha gelek pirtûk û xebatên wî hatine weşandin. Vê dawiyê wî û Elîxanê Memê ji bo pola yekê heya pola diwazdehan pirtûk amade kirine ji bo dibistanên kurdî. Niha çapdar, nivîskar, nûçevan û belavkarê rojnameya Rêya Teze ye.



Samî Hêzil

# Baweriya Ahmedê Hepo

Ahmedê Hepo çavê xwe bi koçberiyê, bi biryara sirgûna ber bi kanên komirê yên li welatê Qazakistanê vekir. Li warekî reş û qîr, li welatekî sikîsar dest pê kir û heta îro didome serpêhatiya wî ya li dinê. Temenê wî yê dirêj îsal bû 87 sal. Serpêhatiya wî ya 87 salan jê re bû 'Birîn, Bîranîn, Bawerî' û çendîn berhemên din. Hepo pola yekem a dibistanê sê caran û bi sê zimanan xwend, bi zimanê qazaxî, rûsî û dawiyê jî azerîkî. Bû şahidê mirinên li sirgûnê û bû qasidekî zarok ê malbatên ji hev cudakirî.

"Sulhedîn dema ji otobusê peya bû ro hilatibû, tava biharê nû dizeriqand." Hepo bi lehengê bi navê Sulhedîn vedike devê gotinê di romana xwe ya bi navê Bawerî de. Her wekî bi tilnîşanekê Sulhedînê dîrokî amaje bike, ew lehengê kurd ê ku ji çiyayên Kavkazê heta çolên Misrê nav û dengê xwe bi şûrê xwe şingand. Û pê re jî sehneyeke bihuştî saz dike bi "kakekaka qarîtan, wîtewîta çivîkan... û bi keriyên bizinên kovî û xezalan."

Ji rûpelên destpêkê û pê ve, her ku Sulhedîn gav bi gav bi pêş de dimeşe, hişê wî jî ber bi paş de vedike kêliyên bîranînan. Bîranên ku ji kur ber pê bav û ji bav jî ber pê bavpîr dixuşxuşin wek ava çemê Erezê. Sulhedînê ku li pey xwe serpêhatiyên dijwar hiştî, vedigere gundê xwe, wek Memê Ebasî ku dayik lê nenasî. "Pîrikê, mêrikek li pêşberî odê sekiniye, tu dibêjî qey parsek e." Her wekî Ulysses e ku bi cilûbergên mîna yên parsekan xwe nîşanî kurê xwe Telemachus dide.

Di vê berhemê de Hepo arîşeya kurdan a eslî ya hezar salan radixîne pêş çavên xwînerên xwe, bi awayekî têgîner û hêsan. Birîna ku Hepo qal dike birîna parçebûnê ye. Tê de behsa kurdan wiha tê kirin: "Ev parçebûn kê kiriye nava wan, ew birîna kûr çi birîn e?" Hepo di Baweriyê de arîşeyên gelê kurd ên sereke, an ku parçebûn, bêtifaqî û neyartiyê dike problema bingehîn a berhemê û bi devê bapîr Hilo wiha pêşkêş dike: "Em eşîr bi eşîr, êl bi êl, qebîle bi qebîle û mal bi mal bûne". Û wek çareserî jî, dîsa bi temsîla di şexsê Hilo de –Hiloyê bokeberan, zexm û aqilmend– yekitiya navxweyî û xwespartina bi hikûmeta bolşevîk destnîşan dike: "Dibên li wî alî Erezê hikûmeta nû tu cudatiyê nake nav gelan, her tişt heye."

Bawerî jî her wekî romanên din ên êwra Kavkazê xwedî du beş in ku tê de du jiyan, du dîmen, du helwest û du teknîk hene. Jiyana berê ya tijî pirsgirêk û bûyerên eşîrî û jiyana nû ya di sîstema nû de û bi pirsgirêkên xweserê xwe. Di beşa yekem de nivîskar/vebêj alîgir e, niyet-xuya ye, bi edetên vegotina çîroka gelêrî baş û nebaşan ji hev vediqetîne. Di beşa duyem de kelecana mirovên baş, hewldana sazkirina qaydeyên nû bi teknîka vegotina modern tê neqilkirin. Mirovên xirab bi temsîla daxwaz û azweriyên tarî yên aîdî sîstema berê di nav pergala nû de tên nîşandan. Bawerî her çiqas berhemeke kurt be jî, bi qewareya novellayekê, gelek bûyerên bi hûrgilî dikevin nav hev. Wisa diyar e ku bandora çîrokên gelêrî yên wek potporiyên bûyeran li ser vegotinê çêbûye. Lê ji aliyekî ve jî, ev taybetiya berhemê diyardeyeke guherîna cureyî ya vegotina çîrokî ye ku Baweriya Hepo li nîveka vegotina gelêrî û teknîka nûjen disekine.

Bawerî çawa ku xasyetên civaka eşîrtiyê, nakokiyên eşîran, helwesta takekesên ku eşîrkaniyê dikin rexne dike û çarenûsê jî bi helwesta takekesên ku meseleyê bi feraseta ser-eşîrî dinirxînin dide diyarkirin; bi heman awayî li hember azweriyên xwedîbûna mal û milk û daxwazên din jî xeyala bi jiyana nû bi pîroziya kedê û romansa hezkirinê nîşan dide.

Li aliyekî tîpolojiyên ku di nav sîstema nû de naguherin û temsîla kiryar û helwestên kevn dikin hene, wekî bavê Avgerdenê Resûl û li aliyê din jî lehengên wek Sulhedîn û Avgerden hene ku dadigêrin li ser motîfên klasîk ên wek Mem û Zîn. Hepo, tîpên erênî yên wek Hilo û Hezare ku di nav konteksta jiyana kevn de xuya dibin, di şexsên Sulhedîn û Avgerden de li hundirê jiyana nû vedijîne bi helwesteke dûnadûnî û ji bo wênedarkirina xasyeta xirabiyê jî li şûna Memedê kurê Osman ê dewra berê, Resûl wek antagonîstê jiyana nû yê berjewendîperest datîne holê.

Vêca Hepo di Baweriyê de baweriya xwe bi çi tîne? Diyar e ku baweriya wî bi hişmendî û daxwaza dilê Hiloyê simbêl palik ku dibêje "gişkan dest bida hev û di govenda yekitiyê de bireqisiyana...", bi lehengiya Hezare Xanimê "ew jina mêrkarkî, ku rûdine jin e û radibe mêr e" û bi pêşeroja li nav destê Sulhedîn û Avgerdenê heye/hebûye. Hepo û Bawerî, wek afirîner û berhem, xwedî helwest in û terefgir in. Bi temsîla mirovên qenc doza yekitiyê dikin. Bi destên qurbaniyên wek Şerbet û Perîşanê tolê ji zulimkaran vedikin. Bi romansa evîndarên ciwan jî hestên xwîner bi hêviya pêşerojeke xweş dikelînin. Wa ye temsîleke neteweperweriya kurdî di romana êwrekê de.

# Segwer (Reyîn) û wêjeya rexneyî

Ahmed Kanî

Di wêjeya kurdî de roman, piştî salên 1980'yî gihîştiye asteke baş. Bi taybetî jî romanên kurdiya soranî, asta vê pêşketinê diyar dikin. Yek ji wan romanên hêja jî romana Mihemed Mukrî ya bi navê 'Segwer (Reyîn)' e. Ev roman di sala 1982'yan de hatiye çapkirin. Di 2015'an de, ji soranî bo kurmancî, ji aliyê Besam Mistefa ve hatiye latînîze û adaptekirin. Me wek Koma Xwendinê ya Amedê, di 11'ê meha nîsana 2021'ê de nirxand.

Roman bîranînên kesek li ber sêdarkê ye. Dem, wek 24 saetên dawîn ên jiyana serleheng hatiye diyarkirin. Şêweyê vegêranê xîtaba bi kesê duyem re ye. Li ser vê şêwazê roman wiha dest pê dike: "Tu îşev nerazayî û hişyar mayî. Hedana te nedihat. Te xwe li ser pişta xwe dirêj dikir. Bi gavekê, te odeya xwe ya tarî qut dikir. Geh tu rûdiniştî û geh te serê xwe dixist nav çokên xwe û te tiliyên destê xwe li hev dipêçan. (...)"(r. 19)

Bi tevî ku di paragrafa yekem de bêhedanî û bêaramiya serlehengê romanê yê xîtaba kesê duyem arasteyê wî, bi awayek monologî hatiye kirin jî lê di pêdaçûna romanê de em dibînin ku objektîfiyek edebî (dualîzm) ya nivîskar heye. Wiha nivîsiye: "Tu dizanî. Gelek caran tu mêrxas û biceger bûyî. Gelek caran tu tirsonek û bêqîmet bûyî. Hin caran jî kawikî û zîrekiyê di eynî dem û cihî de riya xwe bi te xistine.

Vêga tu ji ber xwe fedî dikî eger tu bêjî ez qehreman im. Dilê te jî bi te dişewite eger tu bêjî ez tirsonek im." (r. 20)

Hûnandin (fiction) a bi xîtaba kesê duyem hinek zehmet e. Heta meriv dikare bibêje ku di wêjeya kurdî û ya cîhanê de mînakên vê şêwazê hindik in. Lê nivîskar bi rêya bîranîn û flashbekan diçe jiyana xwe ya pazdeh sal berê: "Bi şevê, piştî nûçeyê, bîranînan mejiyê te vegirtibû û te ber bi dûr dûr û dûrtir dikişkişandin. Bîranîn bûne rêberê te û te birin beriya pazdeh salan." (r. 22)

Di van bîranînan da êş û azarên pêşmergeyekî ku ji ber pêşmergebûna wî, bavê wî yê ku di ciwaniya xwe de ji ber bîr û ramanên xwe hatiye zindanîkirin, di binê lêpirsîna kurê wî û îşkenceyan de dikujin. Diya wî û xwişka wî, Nesrînê di odeyên bêrûmetkirina jinên kurd de bi her cure tacîz û tecawizan re rû bi rû mane.

Ji ber wan êrîşên kirêt, Nesrîna xwişka wî xwe şewitandiye. Xweşewitandina Nesrînê, diya wî wiha vediguhêze: "-Ez û Nesrînê azad kirin. Her wê rojê, di dema êvarê de Nesrînê xwe şewitand. Erê kurê min, êdî tu bi xwe dizanî çima? (...) -Kurê min namûs ji her tiştî girîngtir e. Ez nabêjim ku ez kêfxweş bûm çima Nesrînê xwe şewitand. Lê bi min ne xweştir dibû ez wê di wî halî de bibînim." Li ser vê helwesta nivîskarên kurd du cure nirxandin hene. Hin kes dibêjin ku ew bêrûmetkirina dijmin ancax bi ar tê paqijkirin. Hin jî dibêjin ku ev nirxandinek baviksalarî ye ku jinê biçûk dixîne, rolek ji jinê re nahêle. Bi rastî jî divê rolek çalak a jinê hebe.


Êşek din ku di romanê de hatiye pêşkêşkirin, êşa Dilşad û dayika wî ye. Dilşad zarokek şazdeh salî ye, di nav koma pêşmegeyan de ye ku lehengê romanê fermandar e. Bi tevî ku fermandar karê name birin û anînê dide wî jî ew xwe davêje nav şer û dema şehîd dikeve dayika wî tê ziyareta wî, ew jî di bombebarana balafirên şer de bi Dilşad re şehîd dikeve. Wisa laşê wan bi hev re şewitîne ku ji hev nayên cudakirin. Lewra bi hev re di gorek de tên bicihkirin.

Romanê navê xwe ji peyva "reyîn"ê ya ku lehengê romanê li ser çar alî dîwarên şaneya (hucre) xwe, bi zincîra dest û lingê xwe kolabû, girtiye. Bi bîranîna hevoka Trotsky re, "Di sedsala bîstan de, her kesê ku rehetiyê bixwaze, bi xeletî di vê sedsalê de ji dayik bûye!" dubare hêz dide xwe ku "reyîn"ê binivîse. Êdî peyv bi xwe dişibe kûçikekî û bi reyînek awarte wî dibehitîne. Ew jî xwe davêje ser çarlepkan û dibe ewte ewta wî, lê ji bilî wî tu kes reyîna wî nabihîze. Ev bo rexneya birakujiyê metaforek xurt e.

Dayika leheng li ser şerê birakujiyê jê re wiha dibêje: "Şerm e... qeda li we keve... ger ruhê we ne xema we ye û hûn diberizin canê hev û hevdu dikujin, xema me diyan bixwin. Em dê ne. Em nizanin hûn li ser çi şer dikin û çima di birakujiyê de, destê we bi xwîna hevdu sor bûye! ...xwe bikujin, lê beşdarî şerê birakujiyê nebin!" (r. 50-51)

Ev roman, her çiqasî ji çil û sê rûpelan pêk hatibe jî cîhanek dewlemend a bîranînên wî dihundirîne. Ne tenê êş û azarên jiyana wî, belbî nameyên xoşewîsta wî, Şêrîna ku wiha dest bi nivîsandina nameyê dike: "-Ey yê ku ji xwe bêhtir jê hez dikim!" jî cih girtine.

Gelek taybetmendiyên balkêş ên vê romanê hene. Yek ji wan jî ew e ku roman ji bo helbestvanê kurd Mueyed Teyib re ku ne YNK'î, PDK'î ye, hatiye pêşkêşkirin. Ji ber vê îthafê hinek pêşmergeyên YNK'ê hewla kuştina nivîskarê romanê dane, lê di wê serdemê de ku şerê birakujiyê dihat heramkirin (1998), Celal Talebanî wiha nivîsî: "... gelo mamoste Mukrî berê çi daye we? Gule? Yan peyv..."





Xweşkanî

Felemez Ulug

# Siyaseta înkarê

Ji her alî ve êrîşên dijwar li ser Kurdistanê û îradeya wê ya sîyasî hene. Armanca van êrîşan tunekirina destkeftiyên gelê kurd in, li herêmê bi pêşengiya dewleta tirk û alîgirên wê ve tên birêxistinkirin û birêvebirin.

Her kesê kurd û bi baweriya kurdayetiyê tevdigere li hemberî van êrîşan dibe xwedî bertek ango dibe xwedî helwest. Ev êrîş bi serdegirtina çend şaredarî yan jî bi girtina çend siyasetmedarên kurd ve ne sînordar e, berovajî wê ev êrîş li çar perçeyên Kurdistanê destkeftiyên gelê kurd dikin armanc. Girtina siyasetmedar û saziyên kurd jî gavên vê yên pratîk in.

Ev êrîşên bi pêşengiya dewleta tirk a faşîst ve tên birêxistinkirin û plankirin bi bakurê Kurdistanê ve ne sînordar in. Di hedefa van êrîşan de hemû kurd û destkeftiyên wan hene.

Lewma ne gengaz e mirov êrîşên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, ên li ser Şengal, Mexmûr û Herêmên Parastinê yên Medyayê jî ji van êrîşan cuda binirxîne.

Li bakurê Kurdistanê dijminatiya dewleta tirk a li dijî gelê kurd bi her awayî tê zanîn. Kesên berxwedan û têkoşîna gelê kurd a li bakurê Kurdistanê dişopînin ji nêz ve bûne şahidê zordariya dewleta tirk a li ser gelê berxwedêr.

Dewleta tirk ji bo li bakurê Kurdistane dagirkeriya xwe berdewam bike bi her awayî li ser gelê kurd xwe ferz dike û hebûna kurdan qebûl nake. Êdî ev înkara dewleta tirk ji aliyê gelek hêzên navneteweyî ve jî tê zanîn. Lê ji ber ku di roja me ya îro de berjewendiyên dewletan ketiye pêşiya parastina mafên mirovan, tu hêz naxwaze berjewendiyên xwe bike qurbana gelê kurd. Lewma li dijî vê zordariya dewleta tirk jî dengê xwe dernaxin. Bê deng dimînin ango ji nedîtî ve tên.

**Jiyan îlhama girtiyên azadiyê ye**

Ji ber vê îro li girtîgehên dewleta tirk bi hezaran girtiyên siyasî yên ji ber fikrên xwe tên darizandin hene. Girtiyên azadiyê, ew kesên ku li ber vê zilma heyî serê xwe netewandine û dengê azadiyê bilind kirine. Girtiyên berxwedêr di girtigehan de jî li hember faşîzma heyî serî natewînin. Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger ku li zindanên dewleta tirk a dagirker dewam dike, çar meh li pey xwe hişt.

Girtiyên îlhama xwe ji wî şoreşgerê ku gotibû "Em bi qasî ku ji bo wê bimirin, ji jiyanê hez dikin" îro di bin şertên pir dijwar de li dijî faşîzmê li ber xwe didin. Lewma erk û berpirsiyariya her kurdî ew e ku li dijî vê zilma heyî destkeftiyên ku bi keda van berxwedêran hatiye avakirin biparêze. Ji bo vê divê, li dijî êrîşên li ser îrade û hebûna gelê kurd, xwedî li têkoşînê derkevin.

Li bakurê Kurdistanê di vê astê de li dijî înkara gelê kurd têkoşînek girîng tê dayîn. Lê li parçeyên din ên Kurdistanê rewş çawa ye?

Bêguman li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bi pêşengiya kurdan, li herêmê pêşveçûnên girîng tên jiyîn. Bi taybetî, piştî şerê navxweyî yê Sûriyêyê li dijî înkara bi dehan salan dewam kiriye, kurdan serî hilda û xwedî li hebûna xwe derket. Her çendî bedela vê ji bo gelê kurd giran bû jî tevî hemû êrîşan pêkhateyên herêmê xwedî li hebûna xwe derdikevin.

**Pergala înkarê li her derê ye**

Pergala înkarê ya li bakurê Kurdistanê ji bo gelê kurd li vê qadê jî nebe xwedî maf û li dijî polîtîkayên înkarê tênekoşe, bi her awayî êrîş dike. Êrîşên li ser Efrîn, Serêkanî û Girê Spî çend mînakên vê yên biêş in. Wek di van êrîşan de jî hat dîtin ku dewleta tirk bi tu awayî tehamulî hebûna kurdan nake û ji bo li welat û derveyî welat îradeya kurdê azad têk bibe çi ji destê wê tê dike.

Di vê mijarê de dewleta ku pergala xwe li ser înkarê ava kiriye herî zêde sûdê ji kurdên xwefiroş digire.

Kurdên bi vî rengî îradeya xwe teslîmî neyarê xwe kirine hem li bakur him jî li rojavayê Kurdistanê, di bin navê qaşo muxalefetê de, bûne lîstika destê dijmin. Her çendî hejmara van kesên kêm be jî ya girîng îxaneta wan a bi neteweya wan re ye. Lewma ev hewildanên bê îradekirin û tunekirinê bi destê van kesan jî bi hemû girîngiya xwe ve dewam dike. Her çendî gelê kurd ev kes nakiribin û li gor wê nêzî van kesan dibe jî hebûna wan li pêşiya pêşveçûna neteweya demokratîk astengiya herî mezin e.

Li başûrê Kurdistanê jî rewş ne pir cuda ye. Bêguman PDK'ê ji bo azadiya gelê kurd di dema xwe de bedelên pir mezin dane. Gelê Kurd ji bo vê tekoşîna ku azadiya Kurdistanê dike armanc bigihêje armanca xwe bi hemû derfetên xwe destek dayê. Lê di roja me ya îroyîn de PDK'ê bi emelê xwe ve, keda gelê kurd û bedelên hatine dayîn hemû pûç kir.

**Piştî rejîma Sedam**

Li Iraqê piştî têkçûna rejîma Sedam Huseyîn avabûna Herêma Federe ya Kurdistanê ve PDK'ê dev ji têkoşîna neteweyî berda û entegreyî pergala kapîtalîst bû. Lewma mirov dikare bêje PDK li başûrê Kurdistanê bi qasî ku ji bo berjewendiyên hêzên kapîtalîst kar dike her ewqas ji bo gelê kurd tênakoşe. Ev jî bi xwe re metirsiya têkçûna destkeftiyên gelê kurd ên li başûrê Kurdistanê tîne.

Mîzansena referandûma Kurdistanê jî parçeyekî vê bû. Em ji bîr nekin ku piştî referandûma ku bi israra PDK'ê hat kirin û şûn ve gelek destkeftiyên ku di encama bedelên mezin de hatibûn bidestxistin têk çûn. Li başûrê Kurdistanê PDK'ê li şûna berê xwe bide Kerkûkê û ji bo azadiya wê têbikoşe hewil dide Şengalê jî radestî hêzên dagirker bike. Şengala ku li dijî hemû zordestiyên li ser hatine ferzkirin bi tenê hatiye hiştin îro di hedefa lîstikên pir qirêj de ye. Ji ber vê yekê ji bo gelê kurd ya girîng ew e ku li dijî van hewildanên înkarê xwedî li hebûna xwe derekve. Ev erkeke neteweyî û niştimanî ye.

# 'Yekitiya neteweyî ya kurdan armanca me ya stratejîk e'

Navenda Nûçeyan

Têkildarî destpêkirina diyaloga kurdî-kurdî endama PYNK'ê Sema Begdaş axivî û diyar kir ku hewce ye PYNK dev ji hincetên xwe berde û ji bo yekitiya neteweyî em bi hev re gavan biavêjin

Diyaloga kurdî-kurdî salek berê dest pê kiribû. Hevdîtinên di navbera Encûmena Niştimanî ya Kurdên Sûriyeyê (ENKS) û Partiyên Yekitiya Niştimanî ya Kurdî (PYNK) de, herî dawî ji ber nelihevkirina li ser xalên mîna perwerdeya kurdî û hevserokatiyê xitimîbûn. Bi destpêkirina hilbijartinên Amerîkayê şandeya amerîkî ya navbeynkara diyalogên di navbera her du aliyan de, vegeriyabû Amerîkayê û ev yek jî wek sedemeke sekinandina diyalogê hatibû nîşandan. Piştî hatina nûnerên Amerîkayê yên nû diyolagê bi tu awayî dest pê nekiribû.

Di rojên borî de di 28'ê adara 2021'ê de Fermandarê Giştî yê HSD'ê Mazlûm Ebdî bang li ENKS û PYNK'ê kir ku li diyalogan vegerin. Piştî banga Ebdî PYNK-ENKS ragihandin ku banga Mazlûm Ebdî bi awayekî erênî dîtine û dê dest bi hevdîtinan bikin. Der barê destpêkirina diyaloga kurdî-kurdî ya dawî de em bi berdevka PYD'ê û endama PYNK'ê û endama diyaloga kurdî-kurdî Sema Begdaşê re axivîn.

**'Du hêzên leşkerî nabin'**

Endama diyaloga kurdî-kurdî Sema Begdaş di axaftina xwe de ragihand ku heta niha jî hevdîtinan dest pê nekiriye tenê hevdîtinên di navbera şandeyan de hatine kirin û wiha got: "Me her du aliyan jî ji dema hilbijartina Amerîkayê vir ve hêj hevdîtin pêk neaniye. Ger em rûnin mijarên ku werin nîqaşkirin ev in; xalek ji rêveberiya xweser maye û ya din jî meseleyên leşkerî mane ku ew jî bi rêkeftina Duhokê bi HSD'ê re şêwazên wê tên nîqaşkirin. Bêguman em her tim jî dibêjin du hêzên leşkerî nabin, heta niha kîjan hêz hebe hewce ye ew berdewam bike. Helbet rê û rêbazên vê yekê jî bi HSD'ê re tên nîqaşkirin, li ser esasên rêkeftina Duhokê. Berî çend rojan nûnerên Amerîkayê ji bilî civînê, hem bi PYNK û hem jî bi ENKS'ê re cuda cuda hevdîtin kirin. Wan jî got ku hewce ye astengiyên li ber van diyalogan ji holê rabin û hevdîtin dest pê bikin, çi astengî hebin ji holê rabin. Ew jî dixwazin ku diyalog bigihîje serî."

**'Pêdivî bi yekitiyeke xurt heye'**


Begdaş bal kişand ser girîngiya hevdîtinan û da zanîn ku pêwîstiya gel, partî û saziyên kurdan bi yekitiyê heye û ev tişt anî ziman: "Îro li Rojhilata Navîn şoreşên gel çêdibin, deskeftiyên kurdan hene, sîstem tên guhertin. Kurd jî tim bûne qurbaniyên siyaseta van sîsteman. Ji bo vê yekê jî pêdiviya kurdan bi awayekî lezgînî bi yekitiyeke xurt heye. Îro li rojavayê Kurdistanê rêveberiya xweser a ku mafên hemû neteweyan diparêze, pêşengiyê dike. Divê ku pêşengiya yekitiyê jî bike, ev destkeftiyên li Rêveberiya Xweser nebin lîstikên siyaseta dewletan. Ger ev meseleya hevdîtinan pêk neyê dê bandoreke neyînî derkeve. Dema ku kurd yekitiya xwe pêk neynin û di qada navneteweyî de her parçeyek li gorî xwe tev li emeliya siyasî bibin wê demê dê tu nêzikatiyên cidî jî li hember kurdan nebin. Mînaka herî li holê jî Rojava ye. Ev deh sal in ku Rêveberiya Xweser heye lê di civînên çareserkirina pirsgirêkên Sûriyeyê de nayên qebûlkirin û tên dûrxistin. Ger yekitiya kurdan bi vê diyaloga kurdî-kurdî pêk were dê ev modela Rêveberiya Xweser a Demokratîk bibe mînak ji bo cîhanê. Hewce ye em bibin yek helwest."

**Hincetên ENKS'ê**

Sema Begdaş destnîşan kir ku aliyê PYNK'ê heta niha tişta ketiye ser milên wan bi cih anîne û wiha domand: "Em wek şandeya PYNK'ê heta niha tişta para me ketiye ji sedî 90 me kiriye tenê mijarên leşkerî yên ku bi HSD'ê werin nîqaşkirin mane. Li gorî me zehmetiyên heyî me derbas kirin. Niha tiştên mayî jî divê em bibin serî. Yanî carinan tiştên gelek biçûk jî ENKS dixe mijara nîqaşê û dike ku diyalog bisekine. Mînak, ev sê meh in ku diyalog sekinîne tenê niha dibêjin hewce ye PYNK lêborîna xwe bixwaze. Hewce ye em li ser meseleyên wisa muhasebeyan nekin ger wisa be em ê tu carî nekarin bi pêş bikevin. Hincetên şandeya ENKS'ê hincetên bi vî rengî yên pir biçûk in. Hêviyên me ev in ku em vê diyalogê bi awayekî lezgîn bibin serî. Îro dewletên wek Amerîka û Fransayê ji bo kurd bibin yek piştgiriyê didin."

**Ger kurd bibin yek...**

Endama PYNK'ê herî dawî diyar kir ku ew hewl didin diyalog erênî bi dawî bibe û wiha got: "Em dixwazin mizgîniya yekitiyê bidin gelê kurd. Van mehên pêşiya me hewce ye diyalog bi encameke erênî bi dawî bibe û mizgîniya yekitiyê bidin gelê kurd. Em, PYNK di vê meseleyê de cidî ne. Meseleyên yekitiyê her tim hedefa me ya stratejîk bû. Her wiha kurd dikarin bi yek projeyê, bi yek dengî hem ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdan hem jî bi projeya demokratîk a Sûriyeyê bibin yek û pêşengiyê bikin. Ji ber vê jî gere em van astengiyên biçûk ê ji pêşiya xwe rakin."



# Biden Rûsya hişyar kir



Hefteya borî serokê DYA`yê Joe Biden di civîneke çapemeniyê de axivî û wiha got: "Em nikarin rê bidin hêzên biyanî ku destwerdanê di hilbijartinan de bikin. Me bi zelalî ji Rûsyayê re got ku em ê bersiva êrîşên wan ên li dijî DYA'yê bidin."

Biden li axaftina xwe zêde kir: "Me biryar da ku em dîplomatên Rûsyayê ji Amarîkayê derxin wek bersiva destwerdana Moskovê di hilbijartinan de û bersiva her binpêkirinekê bidin."

Biden der barê civîna pêşniyarkirî ya bi serokê Rûsyayê Vladimîr Pûtîn re wiha got: "Min ji hempîşeyê xwe yê Rûsyayê re bi armanca gotûbejkirina astengiyan li ser dosyaya nukleerî ya Îranê civînek pêşniyar kir."

Biden bang li Rûsyayê kir ku ragejiya li ser sînorên Ukraynayê kêm bike û ev tişt anî ziman: "Min ji Pûtîn re got dibe ku DYA'yê cezayên din ferz bike."

***WASHINGTON***

# Hesabên Rûsyayê yên li Sûriyeyê

Navenda Nûçeyan

**Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveberiya Xweser a Bakur-Rojhilatê Sûriyeyê Bedran Çiya Kurd têkildarî vekişîna hêzên Rûsyayê got ku Rûsya dixwaza bi rêya şantajê hin tiştan bi dest bixe**

Rûsya polîtîkayên xwe yên durû li Sûriyeyê didomîne. Di 13'ê nîsanê de yekîneyên rûs ji gelek nuqteyên herêma Şehbayê vekişiyan. Piştî vekişîna hêzên Rûsyayê herêm ji aliyê dewleta tirk û komên girêdayî wê ve hat topbarankirin. Li dijî êrîş û nêzîkatiyên hêzên Rûsyayê gelê Şehbayê bi çalakiyên xwe helwesteke tund nîşan da. Navenda Çavdêriya Mafên Mirovan a Sûriyeyê jî diyar kir ku nuqteyên ji aliyê hêzên Rûsyayê ve hatibûn valakirin, hêzên alîgirên Îranê lê bi cih bûne.

Lê hêzên Rûsyayê piştî rojekê dîsa vegeriyan nuqteyên xwe yên li Şehbayê ku vala kiribûn. Ev tevgerên hêzên Rûsyayê ne cara yekem in, gelek caran li navçeya Eyn Îsa û Til Temirê jî bi heman şêwazê tevgeriyan. Der barê çûyîn û hatina Rûsyayê de Cîgirê Hevserokatiya Meclisa Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Bedran Çiya Kurd axivî.

**Têkliya Rûsya-Tirkiyeyê**

Bedran Çiya Kurd der barê vekişîna Rûsyayê de diyar kir ku sedemên vekişînê du îhtîmal in û wiha got: "Yek; Rûsya û dewleta tirk li hev kirine ku hinek gund û herêmên Şehbayê radestî çete û dewleta tirk bikin. Her kes dizane ku demeke dirêj e di navbera Tirkiye û Rûsyayê de bazareke li ser herêma Şehba û Til Rifatê heye. Ger tiştek wiha di navbera Rûsya û Tirkiyeyê de hebe dê ne ji bo berjerwendiyên gelên Sûriyeyê û çareseriya Sûriyeyê be. Tifaqekeke wiha dê bi temamî bikeve xizmeta komên tundrew û dagirkeriyê. Dê bibe sedema koçberiya bi sed hezaran mirovan. Zêdetirî 250 hezar mirov li wê herêmê dijîn, ji wan zêdetirî 100 hezar koçberên Efrînê ne. Ger careke din êrîşek dubare çêbibe dê karesateke mirovî derkeve holê. Divê her kes li ser vê baldar û hişyar be.

**Şantaj û zext**

Îhtîmala duyem jî Rûsya û berpirsyarên wan ên herêmî bi vê şêwazê dixwazin zextê li kurdan û rêveberiya herêmê bikin da ku hinek daxwazên xwe pêk bînin. Beriya niha jî çend caran li Eyn Îsa û Til Temirê ev şêwaz bi pêş xistin. Bi rêya şantaj û zextan dixwazin li rojhilatê Herêma Firatê hin tiştan bi dest bixin. Rêbazên gef û şantajan dîsa ne mimkun e bibin rêbaza çareseriyê. Hemû pirsgirêkên heyî dê bi danûstandinan bên çareserkirin. Çawa destpêkê ji Efrînê vekişiya, li Eyn Îsa û Til Temirê jî çend caran wiha kir, niha jî li Şehbayê wiha dike ku ev ne rêbaza pêkhatina aramiyê ye."

**Hêzên li herêmê**

Cîgirê Rêveberiya Xweser Bedran Çiya Kurd di axaftina xwe de bal kişand ser sedemên şantajên Rûsyayê û wiha domand: "Hêzên Rûsyayê di herêmê de her dixwazin xwe xurt bikin, bikevin hemû herêman. Di herêmê de ne tenê HSD û Rûsya, hêzên koalîsyonê û amerîkî jî hene. Ev gelek caran di navbera hêzên rûsî û amerîkî de pirsgirêk derdikeve. Bêguman daxwazên Rûsyayê yên aborî jî hene. Dibe ku di hinek mijaran de me li hev kiribe û hinek mijar jî wekî ku tê xwestin em nikarin di vê demê de li hev bikin. Ji ber lihevkirin û garantiyên siyasî pêwîst in. Îmkanên aborî yên ku li herêmê hene yên tevahî Sûriyeyê ne. Em jî dixwazin bi şêwazeke adilane ku mafê gelê herêmê jî tê de hebe, çêbibe."

**Hesabên li herêmê**

Bedran Çiya ragihand ku vekişînên Rûsyayê yên bi vî rengî gelek caran çêdibin û diyar kir ev vekişandin herêmî û lokal in û ev tişt anî ziman: "Rûsya tu carê nade ber çavan ku bi temamî ji herêmê vekişe. Ji ber ku piştî vekişîna hêzên Amerîkayê û êrîşên li ser Serêkaniyê û Girê Spî û li şûna wan belavbûna hêzên Rûsyayê, ji bo xwe weke serkeftin û pêşketineke girîng hesiband. Ne ku bi paş ve vekişe, lê hesab dike ku çawa zêdetir berfireh bibe. Ji bo wê jî em texmîn nakin ku vekişîneke giştî çêbibe. Dixwaze berbelavbûna xwe zêde bike û hinek destkeftiyên din bi dest bixe."

**'Hemû rêyên çareseriyê xitimîne'**

Çiya Kurd bal kişand ser rola Rûsyayê ya di dewletên ereban de û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Civîneke sêalî di navbera Rûsya, Tirkiye û Qeterê de çêbû. Armanca Rûsyayê ew e ku welatên ereban ber bi xwe ve bikişîne û têxe xizmeta berjewendiyên siyasî yên ji bo Sûriyeyê. Di bin înîsiyatîfa xwe de rê li pêş çareseriyeke siyasî veke. Ji ber ku hemû rê xitimîn; Komîteya Destûrê, Astana û hwd. xitimîn. Vê carê xwest ku bi înîsiyatîfeke nû welatên ereban bi xwe re bike hêz û rê li pêş înîsiyatîfên nû veke. Li aliyê din jî xwest li ser welatên ereban zextekê çêbike ku bi wan bide qebûlkirin û hikûmeta Şamê nûnerên xwe bişîne cem Yekitiya Erebî û ji hikûmeta Şamê re rewabûnekê çêbike. Rûsyayê xwest ku bi pereyên welatên ereban bi şêwazên cuda krîza li herêmên ku hikûmeta Şamê lê serwer e, sivik bike û sûdê jê werbigire."





# Ukrayna dixwaze tev li NATO'yê bibe

Navenda Nûçeyan

Serokê Ukraynayê Volodimir Zelenskî li hemberî Rûsyayê daxwaza piştgiriyê ji welatên Ewropayê kir û xwest ku desteke bidin tevlêbûna wan a NATO'yê. Zelenskî da xuyakirin ku welatên Ewropayê heta niha gelek piştgirî daye Ukraynayê û ev yek di ambargoyên wan ên li dijî Rûsyayê de xuya dibin.

Zelenskî di berdewama daxuyaniya xwe de bal kişand ser mijarên ewlekariyê û wiha got: "Ewlekariya Ukraynayê tê wateya ewlekariya welatên Ewropayê, divê em heta hetayî li hêviya Yekitiya Ewropa û NATO'yê nemînin."

Her wiha serokê Ukraynayê di dawiya axaftina xwe de bi bîr xist ku dê bi serokên Ukrayna, Fransa û Almanyayê der barê nakokî û şerê herêma Donbasê ya rojhilatê Ukraynayê de li hev bicivin.

# 128 milyar dolar li ku ye?

Navenda Nûçeyan

Di navbera sala 2019'an û 2020'î de, ji rezerva Bankaya Navendî ya Tirkiyeyê 128 milyar dolar pere bi awayekî veşartî û nezelal hat firotin.

Tirkiyeyê ji demên ewil yên îktîdara AKP'ê bigire heta van salên dawîn rezervên xwe yên dovîzan tim zêde kir. Di sala 2002'yan de rezervên Bankaya Navendî ya Tirkiyeyê 27,6 milyar dolar bû lê piştî 8 salan rezerva bankeyê derket 80, 6 milyar dolarî. Lê bi krîza aboriyê ya 2011'an re rezervên Tirkiyê heliyan. Ji 2011'an vir ve jî rezerv her tim dihelin.

Di sala 2018'an de qeyrana kûrê ya cîhanî tesîra xwe li aboriya Tirkiyeyeyê kir. Ango qîmeta pereyên biyanî li hemberî nirxê lîreyê Tirkiyeyê zêde bû û nirxê lîreyê tirkan daket rêjeyeke pir kêm. Li ser vê yekê, Tirkiyeyê ji bo ku pêşiya vê qeyranê bigire, demildest çû rezervên dovîzan ji bo xwe kirî. Heta radeyekê vê rezervê kir ku dolar zêde biha nebe, lê dema rezerv qediyan, nirxê dolar dîsa zêdetir bû.

**Albayrak çû 128 milyar dolar jî çû**

Bi pandemiyê re heriya ku Tirkiye ketibûyê bêtir xuya bû. Muxalefetê îdia kir ku di dema wezareta Berat Albayrak de 128 milyar dolarên Tirkiyeyê hatiye firotin. Piştî ku Albayrak di 8 mijdara 2020'î de, ji karê wezaretiyê îstifa kir, gumanên der barê xerckirin û firotina rezervên dovîzan de, zêdetir bûn.

Di pêvajoya îstîfakirina Albayrak de, Nacî Agbal wekî serokê Bankaya Navendî hat erkdarkirin, lê di meha adarê de ji seroktiyê hat dûrxistin. Hat îdiakirin ku Agbal der barê rezervên wenda de lêpirsîn dabû destpêkirin û ev yek jî bû sedemê dûrxistina wî ya ji serokatiyê.

**Ji 40 milyar dolarî dakete bin sifirê**

Di dema wezaretiya Albayrak de, ji bo nirxê dolar di asteke sabît de bimîne, bi rêya bankayên gel rezervên dovîzan hatin firotin û ev wekî polîtîkayekê hat hilbijartin. Lê vê yekê kir ku rezervên Bankaya Navendî bihele. Li gorî hin ekonomîstan, heke karên li ser swapan (pevguherandina faîz û yekeya pereyan ya di piyaseya navneteweyî de) jî bê hesabkirin rezervên net yên Tirkiyeyê daketiye bin sifirê û rêjeya wê 40 milyar dolar di bin sifirê de ye. Li gorî muxalefetê ev rezerv bi awayekî nepen hatiye firotin û ne li gorî qanûnên aboriyê ye.

**Li dû şopa 128 milyar dolarî**

CHP û partiyên muxalif ên mayî, vê yekê wekî amûreke muxalefetê li hemberî AKP'ê bi kar tînin. Her wiha CHP'ê hin afîşan der barê mijara firotina 128 milyar dolaran de amade kir û pêşî bi navendên partiya xwe ve kir, dû re li hin bajar û navçeyan belav kir. Lê hikûmeta AKP'ê demildest polîsan erkdar kir û afîş hatin komkirin. Afîş û pankartên der barê mijarê de hatine qedexekirin û ev yek li meclisa Tirkiyeyê bû mijara nîqaşê.

Serokê partiya DEVA'yê Alî Babacan jî li ser firotina 128 milyar dolarî gelek caran, berê xwe dide hikûmetê. Her wiha Babacan bixwe jî dema di nav AKP'ê de bû, serokatiya wezareta aboriyê û karên derve kiribû.

Cîgirê Serokê Koma Partiya Demokratîk a Gelan (HDP) Saruhan Oluç rojeva Tirkiyeyê de li meclisê civîna çapemeniyê pêk anî. Oluç di civînê de bal kişand ser 128 milyar dolarê ku ji aliyê hikûmetê ve hatiye windakirin û destnîşan kir ku ew ê vê mijarê paşguh nekin û bidin dû şopa wî pereyî.

Ji aliyê hikûmeta AKP'ê ve der heqê mijarê de gelek caran hin daxuyanî tên dayîn lê hê jî gumanên gel û muxalefetê zêde ne.




**Rezervên dewletan çi ne?**

Bankayên navendî yên dewletan, ji bo ku pereyên wan ên xwemalî bikaribe li derveyî welat jî bikeve nav piyaseyê û ji bo dahat û lêçûyên sermayeya welat ji bandorên neyînî biparêze, di bin banê xwe de rezervên dovîz û zêran çêdikin. Bi vî awayî karên dovîzan, rêjeyên faîzan tên tetbîqkirin û her wiha bi vî awayî tê armanckirin ku baweriya sermayeyên biyanî bê xurtkirin. Digel vê yekê rezervên dewletan ji bo deyndariya wan jî tên bikaranîn. Heke rezervên dewletekê zêde bin, ew bêtir û zûtir dikare ji aboriya navneteweyî deyn bike, lê ku kêm be zû bi zû kes deyn nade wan. Rezerv di vê mijarê de dibin temînata dewletên ku deyn dikin. Ev rezervên ku ji teref dewletê ve û bi rêya bankayên navendî tên çêkirin, bi veberhênan (mewduat) û xerckirina navxweyî ve girêdayiye. Ango dema ku rêjeya rezervan zêde dibe, veberhênan û xerckirina dewletan kêm dibe. Ji ber vê yekê bêkarî zêdetir dibe û îstîhdam çênabe.

# Nasname û vîna xwedayî




Reyhan Îke

Meha remezanê di çanda îslamê de wekî meheke pîroz tê pênasekirin. Bi wateyeke din meha xwe paqijkirina ji guneh û heramiyan e. Ango bi wateya rast qonaxa empatiyê, hewla fêmkirina kesên beramber, li beramber afirînerê mezin û pîroz platformeke rexnedayînê ye ji bo hemû bawermendan.

Hemû rêûresmên wekî rojî, nimêj, fitir, zekat û hecê bi vê armancê tên kirin. Ango xeletî û nebesiyên xwe bi rêya başiyan xwestina lêborîn û xwe di warê manewî de pak û paqijkirin, armanca van rêûresman e. Li gorî baweriya ola îslamê, tu mirov ji ber nijad û neteweya xwe, reng û zayenda xwe, ziman û çanda xwe û cudahiya xwe ne tawanbar e û afirînerê hemû zindeweriyê xweda ye.

Bi zanîna van xalên jor, em dikarin hinekî li nasnameya xwe binêrin. Wekî zindî em xwedî nasnameyeke hevpar in; mirovbûn. Zayend, nijad, reng û çermê me rastiya me ya ku em hemû ji hiş û giyan pêk tên naguherîne. Di hemû mirovan de zagona pêkhatina hiş û giyan hema wekî hev dixebite û li gorî hemû baweriyên olî ev berhema afirîneriya xwedayî ye.

Di roja me ya îroyîn de, yek ji xalên herî girîng û li ser tê sekinandin nasname ye. Ji ber li gorî pisporên mijarê, nasname taybetmendî û çawaniya kesî nîşan dide. Di heman demê de ferq û cudahiya kesî datîne holê. Bi wateya giştî hemû taybetmendiyên kesî di nav xwe de dihewîne. Bêguman, ev mijarek dorfireh e û dîsa li gorî kesên bi vê mijarê re eleqeder dibin, gelek nasnameyên mirovan hene. Mirov bi rêya nasnameyê bi civaka derdorê re têkiliyan saz dike û ahengekê pêk tîne.



Yek ji van nasnameyan nasnameya mirov a genetîk, nijadî ye. Ev bi serê xwe û li derveyî îradeya mirov pêk tê. Her wiha nasnameyeke mirov a çandî jî heye. Di nasnameya çandî de faktora herî girîng ol e. Ol ne tenê cîhana baweriya mirovan, bandor li jiyana civakî û çandî ya mirovan jî kiriye. Ji komika herî biçûk malbatê bigire heta hiqûq, siyaset û têgihiştina aboriyê jî bi awayekî berfireh bandor li wan kiriye û teşe daye wan.

Di ser van nasnameyan re jî nasnameya neteweyî heye. Wekî tê dîtin di ser nasnameya me ya mirovî re gelek nasnameyên xwedestî hatine barkirin. Di avakirina van nasnameyan de rola sereke ya çandê ye.

Her wiha di serdema me de ku serdema modernîteya kapîtalîst e, nasnameyeke di ser van nasnameyan hemûyan re jî heye; nasnameya mirov a aborî. Di vê pergalê de hema bêje pere rola pîroziya xwedayî girtiye ser xwe û nirxa mirovbûnê bi asta aborî tê pîvan. Bêguman, ev tiştên me li jor destnîşan kirin hemû jî vîna xwedayî ya di çêbûna van tiştan de paşguh nake li gorî baweriyên olî. Ji ber li gorî hemû baweriyên olî, zilikek biçûk jî bêyî vîna xweda nalive û her tişt bi vîna xweda pêk tê.

Ger mirov bi vê rastiyê bawer be, wê demê nabe kes ji ber tu nasnameyek xwe bê tewanbarkirin. Tawanbarkirina mirovan ji ber nasnameya wî/wê redkirina vîna xwedayî lidijderketina wê vînê ye. Wekî mînak, îro bi hezaran kurd ji ber nasnameya xwe ya kurdbûnê di girtîgehan de ne. Ji ber heman nasnameyê zilm û zorî li me kurdan tê kirin; girtin, îşkence, kuştin, derbederkirin û hemû kiryarên li dijî pîvanên mirovatiyê yên li ser civaka kurd tên meşandin di bingehê de xwe dispêrin dijberiya li hember vê nasnameyê. Gelo ger kurd ji aliyê xweda ve hatibin afirandin, ne mafê kurdan e ku heyîna xwe azad bijîn? Çand û ziman, civak û nirx, bi kurtî înkarkirina hebûna kurdan nayê wateya lidijderketina vîna xwedayî? Di cihekî de te haşayî li afirînerîya xwedayî anî û te qebûl nekir ku yên ji aliyê xweda ve hatin afirandin bi orjîna xwe bijîn, ev nabe destkariya li vîna xwedayî?

Ji ber tu mirov beriya ji dayik bibe nikare bêje divê ez bi vê zayendê, ji vê nijadê, endamê vê civakê, çand û neteweyê, vê çîn û baweriyê ji dayik bibim. Wê demê ji ber van nasnameyan tawanbarkirin, mezintirîn guneh û tawan e li beramber baweriya bi xweda. Ji ber van nasnameyên kes, kom û civakan zilm, zorî, girtin, kuştin, asîmîlasyon, derbederkirin an jî mecbûrî haşayî anîna li nasnameya xwe ya hiştin jî haşayî anîna li heyîna xweda ye. Nasnameya mirovekî her çi dibe bila bibe wekî sedema tawanbarkirin û çewisandinê dîtin, haşayî li heyîna xweda anîn e. Di heman demê de, ji ber daxwaza hinekî din xwe înkarkirin jî tê wateya înkara xweda. Ango bi qasî yên zilmê li ser van nasnameyan pêk tînin gunehbar in, di heman demê de yên li ber vê zilmê serî ditewînin, vê zilmê erê dikin, haşayiyê li nasnmaya xwe tînin jî ji rêya xweda derdikevin, dibin şirîkên tawanbaran û gunehan dikin. Ji bo kesên wisa tu mehên pîroz, rêûresmên olî nikarin tawan û gunehên wan paqij bikin.

Parastina rûmeta xwe ya mirovbûnê, bawermendiya rast, di serî de rêzdayîna cudahiyên xwe, xwedîderketina li hebûn û nasnameya xwe, cudahî wekî fermana xwedayî dîtin û pîrozbûna wê parastinê ve gengaz e. Nexwe zayenda xwe, nijada xwe, çanda xwe, zimanê xwe, baweriya xweînkarkirinê, di rastiyê de radestbûna evdan û înkarkirina xweda ye. Bi zanebûn an bi nezanî haşayî li xweda anîn, heyîna xweda bi cudahiyan ve afirandî red kirin, hewla guhertina vîna xwedayî, tê wateya nepejirandina vîna xweda û destwerdana li vîna xwedayî. Bi vê wateyê, zayendperestî, olperestî, nijadperestî, dijberiya ekolojîk, dagirkerî û mêtingerî, înkar û faşîzm hemû destwerdana li vê vîna xwedayî ye. Li dijî van bêdeng mayîn û pejirandin, serî tewandin û ji ber berjewendiyên cuda erêkirin jî bi heman wateyê ye. Lewma wekî pêdiviya bawermendiya rast, divê di bin her şertî de mirov li hebûn, xwebûn, rûmet û nasnameya xwe xwedî derkeve. Di heman demê de rêz bide cudahiyan, cudahiyan ji ber vîna xwedayî wek dewlemendî bipejirîne û azadiyê wekî pîvana sereke ya baweriyê bibîne. Wekî encam bawermendiya rast, li hember her awayê zilmê û zaliman têkoşîn û raberkirina helwestê ye.

# Bela reş



Seyidxan Anter

Li welatê me, li bajar û bajarokên Kurdistanê, qabadayî hebûn. Li cih û warê ku dewletê valayiyek hukumdariyê li dûv xwe dihişt, qabadayî tevdigeriyan ku vê valayiyê dagirin û desthilatdariya xwe pêk bînin. Her çiqasî dixwestin xwedî salarî jî bûna, neheqî û çavsoriya li hember hejaran nedipejirandin. Xwedî gurerek berz bûn. Bi çavfirehî, merdî û mêraniya xwe deng dabûn.

Serdema salên 1970 bû, çaxa ku laqabên şoreşgeran Pilingo, Keftaro, Guro, Şêro û navên din bûn -û heqê çaya wan di berîkên wan de tunebû. Gelekan ji wan çaya Etamoto (Hatamoto) vexwarine. Di dawiya salên 1960'an de, gava Apê Mûsa (Mûsa Anter) namzetê parlamentoya tirk ê herêma Mêrdînê bû, Etamoto piştgiriya wî kir. Li gor saloxan Etamoto anha li Stanbolê dijî.

Serpêhatiyek min jî bi vî ciwamêrî re heye. Di destpêka payîza 1973'yan li Nisêbînê, dem dema ku şagirt xwe li lîseyê binivîsînin (qeyd bikin). Mudîr ji Dêrîka Çiyayê Mazî bû. Mudîr Bekir Beg fitûk derxistibû ku li Nisêbînê heta wê rojê kesî ne bihîstibû û ne jî bêna bû.

Fermana ku Bekir Beg dabû navê wê KONTENJAN bû, ango ku çi şagirtekî li dibistanê neyê nivîsîn. Kontenjan nema bû û hejmara xwendevanên li dervî kontenjanê jî xilbe bû. Bêderfetî û nerazîbûna li salona dibistanê hîna li ber çavên min in.

Etamoto li xwe qewimand û ket oda Bekir Beg. Qederekî, ji nik Bekir Beg bêkêf û bi qahir derket û bi dengê xwe yê bilind got: "Ez dê nizanim çi bikim ji vî mudîrî. Me bi hev re fermana Bekir Beg têk bir û em bûn berpirsiyarê (velî) gelek şagirtiyan.

Qara Bela, Xirxir Miço û belkî ji hemûyan bêhtir bê naskirin Pişo Miheme, hin jî qabadayên Amedê bûn. Li ser Pişo Mihemed kitêb hatine lêkirin. Hez ji şoreşgeran dikir, dostê hejaran bû.

Serpêhatiyên wî gelek in. Dibêjin rojekê Pişo Mihemed, li Deriyê Çiyê, li hember qahwexana Elo, di bin siya peykerê M.K. Ataturk de bêhna xwe vedide, xwe dirêj dike û di xew re diçe. Gava ji xew radibe û çiqasî li dora xwe meyze dike jî, pêlava xwe ya 8 qul, serîtûj û panî şikestî nabîne. Berê xwe dide peyker û wiha dibêje:

"Tu di muhareban (şer) de bi ser ket. Me bahwerî bi te anî lê te nikarîbû pêlava 8 qul biparêzî. Ji îro û pê ve navê te ma BETON MISTO."

Kesê ku ketiye zindanê dizane ku li qawîşan hiyerarşî hene. Gelek caran diranên zêr nîşanî yektîr dikirin nîşana "nerazîbûnê". Îca rojekê Pişo Mihemed diçe Deriyê Mêrdîne, li qahwexanê rûdinê û çayê dixwaze. Çaya wî dereng dimîne. Pişo Mihemed bangî xwediyê qahwaxanê dike, diranê xwe yê zêrîn (li rêza paş) nîşanî xwediyê qahwexanê dide û dibêje: "Ka çayê li ku ma?" Xwediyê qahwexanê wiha bersiva wî dide: "Hîn dema xwe negirtiye! Wê bê!" Û hemû dinanên xwe nîşanî Pişo Mihemed dide. Lewra dinanên wî hemû zêr bûn. Pişo Mihemed bê deng û rûniştî li benda çaya xwe dimîne.



Qabadayên Siwêrekê babetek din in. Rojekê Husênê Qera bi filozofî û zargotina xwe naskirî, çakêtê taximê bi êlek li ser piyê wî û meşek bi giranî ji çarşiyê tê. Çend xatûn li gasînê, li ber derî rûniştine û civata xwe gerandine. Kuçe ji keviran bû. Teqeteqa kundura wî ye. Xatûn lê temaşe dikin. Ciwamêr "mûm" dibe. Qundira Husênê Qere ya serî tûj li kevirek ji yê kuçe dialiqe, dilukume û çakêtê wî dikeve erdê. Jin dikenin. Husênê Qere demança xwe ji ber xwe derdixe, surguyê lê dide û cercûrekî li kevirê lê terpiliye vala dike.

Li nav tirkan jî qabadayî bûne mijara film û hunerê. Lê ne îro. Mafia cihê wan girtine. Mafia bi gelek aliyên xwe cuda ne. Ne tenê waliya ku desthilatdarî li pey xwe dihêle dadigrin, her wiha mîna dewletê jî tevdigerin. Çavsorî, bêbextî û xapandin karê wan in. Danûstandinên wan û meqamên dewletê xweş in.

Îca, rê bidin min ez ji we re çîrokekê lêkim. Ev çîroka li jêr serokê Kurdî-Dera Nisêbînê, Hekîmê Mala Qetfo ji min re kat kir. Serpêhatî wiha ye:

Rojekê kerekî dajon axurek nîvtarî û du quloçan pê vedikin. Mafia xelkê tênin ku têt derbixin ka ev çi core (lawir) heywan e. Kesên ku nerast nav lê bikira dê beş (ceze) bidana wan. Ceza jî 1.000 qayme (TL) bû. Xelk rêz kirin. Dora hat û yek kirin axo ku binere ka heywanê li axo çi ye. Ciwamêr zû derket.

- Ma te çi dît?

Ciwamêr ji xwe bahwer bersiv da:

- Min kerek dît.

Mafia:

- Te tê dernexist. Ne ker e, kiloçê keran tune ne!

Û 1.000 qaymî cezê didin wî.

Yê duyemîn dikeve axo û derdikeve û xwe bi xwe madem ne ker, gerek ga be. Beriya ku mafia jê bipirse, dibêje:

- Ga bû!

Mafia:

- Te tê dernexist, ne ga ye. Ma guhên gê wisa dirêjin?

Û 1.000 TL ceza didin wî jî.

Dor tê yekî din. Hejar e. Dixwaze dilê xwe di cih xe ka yên berî wî çi gotine û çi hat serê wan û dikeve hundirê axo û qederekê dimîne.

Mafia jê dipirse:

- Ma te çi li axo dît?

Hejar wiha bersiv dide:

- Ne ker û ne jî ga ye. Hebe tune be, bela reş e!

Vêca haya te ji te hebe haa…

# Xoserîya cinîyan xoserîya komelî ya



Av. Cemila Turhalli

Nê hewteyanê peyênan de operasyonî cinîyan ser o varayî. Cinîyî şefeqan de yan keyeyanê xo de yan zî kargehanê xo de ameyî tepîştiş. Nê cinîyî zanayêne yenî girewtiş. Girewtişê înan heqdarîyê înan ra ameyêne. Merdimî heqanê xo wina lez ferq nêkenî. Qijitîya xo ra heta piltîya xo, hewnê xo ra heta hayebîyayîşî xo ra ewnîyeno. Vernîya xo ra heta peynîya xo ewnîyeno. Bê zerrî û bi zorî çi kerd o wext zaneno ke çîye xirabî virazîyayo. Çiyo ke kes bê zerrî bikero o çî neheqtî ya. Merdimî yan neheqtî qebul bikerî yan zî semedê heqanê xo sere wedarnî. Sereyo ke reyek wedarîyayo çi rey hinî nêyeno war. Çimkî merdimêk ke vîneno ê vînayîşanê xo ra nêeşkenî bêrî war. Çimê ke dinya bivînî ê çimî vîndî nêbenî. Vinayîş tehmo tewr rind o.

Wexto ke merdiman komel pir ona, vera vera fikre înan ameyî meydan. Nê fikran înan rê ge weşîye ge nêweşîye û ge-ge zî herb ard. Her fikir xo ra pey fikrêko newe ano, o fikir zî mezelê fikre werenî keneno. Her fikir ra dima sîyeka derge esta. Ge-ge na sîye xo lez eşkere kerdêne, ge-ge zî nê eşkerayî ser o pîl bîyêne.

Cêko ke cinîyî ameyî dinya, zanenî ke tena nîyî, yew sîye cuya înan dima înan teqîp kena. Na sîye bê cinîyan nêseterîyena. Qijitî ra heta pîltî ha dima ya. Cinîyî na sîye her ca de vînenî. Teber de zî keyeyê xo de zî, heta hewnê xo de zî na sîye ha înan dima ya. La nêeşkenî vajî ke na sîya ma teqip kena. Wexto ke cinîyî fekê xo akenî a sîye fekê înan gêna. Waştîbi a sîye bimocnî na reye destê înan huşk beno. Na sîyê xo nêmocnena, bê cinîyan kesî aye nêvînenî.

Cinîyî gedeyîyê xo de destpêkerdişê kayan ra heta wendegehê na sîye vernîya înan gêna. Ge-ge qiriqa înan tepîşena înan bê nefes verdana, ge-ge zî linganê înan girê dana nêverdana wa rayîrî ra şirî. Heta nika cinîyî vatêne qey her kesî na sîye vîneno. Înan vatêne qey ke hukmê na sîye hesa merdiman ser o yo. La nika zanenî ke na sîye tena cinîyan ra heta bermayîşê înan û huyayîşê înan ser hukmê xo arda. Na sîye nêverdaya ke cinîyî bibî xoser. Ters definêaya zerrîya înan. Giranîya xo daya serê milê cinîyan. Coka nêverdaya cinîyî barê xo bigîrî kiftanê xo û xo cinîyan rê kerda bar.

Na seserre ke no bare cuya xo dewam kerde. Ge-ge bê nefes mendî, ge-ge binê nê barî de mendî û nêeşkayî werzî ra. La hertim aqilê cinîyan de nê barî ra xelesnayîş estibî. Cinîyî no bar kiftanê xo ra girewt ard veraka xo û vereka xo ra zî ard war. Zereyê ey akerd, zereyê înan de kerraya sîyaye dîye. Fehm kerd ke heta nika bîlasebeb no bar girewtî milê xo ser. Çimkî havila kerraya sîyaye înan rê çin a. Fehm kerdî ke ameyî xapênayîş.

Zanayîşê cinîyan xapênayîş qebul nêkerd. Heta nika emrê înan ra çi berd kewt ey/aye dima. La çîyêko bîn esto, o zî zehmet o. Cinîyî senî a kerraye milê xo ra eştî war, a kerraye nika rayîrê înan qefilna. A kerraye nika her ca de, ca girewta nêverdena cinîyî linge bierzî. Rey-rey zî nê kerrayî pê yew destî înan ser o varenî. Coka nê rojan de nê kerrayî hona varenî sereyê cinîyan.

Cinîyî her ca de heqê xo pawenî. Xo bi camêrdan ra pawenî, xo bi dewletan ra pawenî, xo bi patronan ra pawenî. Cinîyî dişmenê kesî nîyî la dişmenê cinîyan zaf estî. Ge-ge pî yo, bira yo, merde yo ge-ge zî patron û dewlet o.

Cinîyî senî sereyê xo kenî berz wazenî bikewî teber, wazenî cuya xo tena dewam bikerî, mêrdeyê înan, înan rê beno dişmen. Dişmentî tena bi vateyî nîyo. Dişmentî kuwayişî ra bigîrêne heta mirênayîş dewam kena. Sotberzkerdiş cinîyan rê heqaret û teda ano. Semedê xo cinîyî gerek çîyêk nêwazî. Gerek xo bikerî tabîyê mêrdeyan. Seba cinîyan di îhtîmalekî estî. Gerek hukmê camêrdan qebul bikerî. Eger hukm qebul nêkerd, şîddet û merdiş zî qederê înan beno.

La cinîyî di rewşe zî qebul nekenî. Rayîro hîrêyin wazenî. O zî xoserîya xo ya. Xoserîya înan tena semedê înan nîya. Xoserîya înan serewedartişê komelî ya. Eger cinîyî xoser nêbî komel zî aver nêşono. Xo bi xo bişinasnî ke, komel bivînî. Xo bi xo bimanî ke komel pîl bikerî.



Nê semedî ra cinîyî xoserîya xo ke vîndîbîyaye wazenî. Dest danî yewbînan. Destê înan germîya înan vila kena. Destê înan nêveradana destê cinîyanê bînan bikero war. Na hewe nêveradanî na sîye destê înan puç bikera.


Tirkîya de nika cinîyê kemalîstan ra bigîrêne cinîyê muhafazakar, sosyalîst û kurdan her ca de, vengê xo semedê xo kenî berz. Semedê heqê kiştişê cinîyan û semedê heqê cinîyan benî yew dest û benî yew kulme. Refleksê cinîyan bîyo serê îdeolojî, serê netewe û serewedartişê înan bîyo serê fikran. Dewlete no refleksî ra zaf tersena. Çimkî zanena ke no refleks verê yew zî nêeşkeno vindero.

Vîndîkerdişê cinîyan çin o la vîndîkerdişê dewlete esto. Cinîyî sereyê xo nêanî war, destê xo nêkenî xo ver, destanê xo girê nêdanî. Dewlete zî ney qebul nêkena, nêveradena destê cinîyî destê komelî bigîrê, nêveradana cinîyî bindestî ra bivejîyî. Nê semedî ra yan zilmê xo zêde kena, yan zî hona pê destê camêrdan cinîyan kena bindestê xo. Eger camêrd serkewte nêbo, o çax pê tacîz, kutiş û mirênayîşî wazena cinîyan esîr bigîra.

Gonîya cinîyan tena destê camêrdan ra nêsawîyaya. Na gonî sawîyaya destê dewlete zî. Camêrd kişeno dewlete pawena. Mutabakatê înan ser sucê înan zî badê, bi ef dewam keno. Dewlete wazena şertanê xo cinîyan ser o bida qebulkerdiş û wazena ke heqê cinîyan orte ra vîndî bikera.

Heqê cinîyan babeta bazarîye nêbenî. Heqê cinîyan girêdayîşê şertî nêbenî. Heqê cinîyan dest nêyenî piranayîş. Çimkî heqê cinîyan tabîî yê û neheqtî qebul nêkenî.

# Şarê kurd verarojê xo Ocalanî de vîneno



Mahir Uzmez

Nizdîyê 23 serrê yo ke dewleta tirkî wazena bi yew hewa tekilîya raberê PKKyî Abdullah Ocalanî û şarê kurdî yewbînan ra qut bikera. Labelê bi serrano eno kar û xebata dewleta Tirkîya vengra şona. Anketê peynî nawnenê ke birêz Abdullah Ocalan çende zî Girawa Îmrali de binê tecrîdî de bibo zî, reyna şarê kurd bîr û bawerîya xo ci ano.

Newroza 2021î de şarê kurd bi mîlyonan vecîya qadan û bi yew venge silogane 'Bicuwîyo Serek Apo' qîra. Wan ra heya Amed, Cizîr ra heya Stenbol vaştişê şarê kurd yew bi û azadîya birêz Ocalanî ame waştiş. Çimkî şarê kurd azadîya xo, azadîya birêz Ocalanî de vîneno.

Şarê kurd çiqas no vaştişê xo bîyaro ziwan, dewleta tirkî hende birêz Ocalanî ser o de tecrîd vêşî kena. Nê rojan de reyna çalakîyê verva tecrîdê serê birêz Ocalanî vêşî biyî. Yew kinarra şarê kurd bi aşmano çalakîyan virazeno, kinaro bin de tepîşteyê zîndanan çalakîya grevê vêşanîye berdewam kenê.

Qala kêm kê şêno vajo, şarê kurd çalakîyanê xo de nawneno; sîstemê Îmrali nîno qebûl kerdiş. Verva hende zor û zilmî çi semed ra destê şarê kurdî birêz Ocalanî ra nêbeno? Cewabê no persî ez cêr de şima rê eşkera bika.

Nê rojan de yew anket hame viraştiş. No anket rolê birêz Ocalanî vet werte.

Mîyanîya Cigêrayîşanê Herême yê Sosyo-Polîtîkan 1-10ê nîsana 2021î de Amed, Êlih, Mêrdîn, Dîlok, Wan, Şirnex, Sêrt, Mûş, Meletî, Îdir, Colemêrg, Xarpêt, Dêrsim, Bedlîs, Çewlîg, Agirî û Semsûr zî tede 18 şaristanan de anketêk viraşte.

Beşdaranê anketî se ra 95,4 kesî xo sey 'kurd' pênase kenê. Anket derheqê 'meseleya kurdan û nêzdîbîyayîşanê çareserî' de daneyan dano.

Bi temamî 948 kesî tewrê nê anketî bîyî.

Persê enê anketî zî zaf balkêş bî. Persa 'meseleya kurd esta yan çinîya?' de se ra 82,3 kesî cewabê 'Meseleya kurdan esta' dayî. Goreyê rayedaranê dewleta tirkî meseleya kurd nêmenda. Labelê şarê Vakûrê Kurdistanî vano ke meseleya kurdî esta.

Yewna persa anketî HDPyî nizdîra alakeder keno. Pers de yeno persnayîş; kamyew partî seba çareserîya meseleya kurd xizmet kena? Cewabê nê persî zî se ra 87,8 HDP bî. Şima zî zanê hukmatê AKP-MHPyî nê rojan de wazeno HDPyî pado, labelê şarê kurd HDPyî sey çareserîya xo adres nîşan dano.

Reyna yewna persî de 'pirsgirêka kurd bi kamik statû çareser bena?' persîyayo. Hemwelatîyê ke tewrê anketî biyî, se ra 57ê înan cewabê; Xoserîya Demokratîke dayî. Yewna pers zî 'Kam vernîya çareserîya meseleya kurdî de astengî virazano?' bî. Cewabê nê persî zî zaf balkêş bî, şarê kurd se ra 45,6 îtîfaqê Cumhurî yan zî Erdoganî nîşan nawnayo.

Reyna persa herî balkêşe ê anketî serê rol û mîsyonê birêz Ocalanî de bî. Pers no yo; 'Goreyê to muxatabê çareserîya meseleya kurdan kam o/a'? Başdarvanê nê anketî se ra 56,5 Partîyê sîyasî yê Meclîsî, Abdullah Ocalan û PKKyî adres newnayê.

No anketî de reyna vecîya werte ke şarê kurd verva heme zext û zordarîyanê dewleta tirkî, hem birêz Abdullah Ocalanî û hem zî projeyê birêz Ocalanî heza HDPyî rayîrê çareserkerdina pirsgirêka kurdî de adres nawneno. Tena no zî nê şarê kurd rayîrê çareserî zî reyna birêz Ocalanî vîneno. Beşdervanê nê anketî nîşan dayî ke rayîrê çareserîya pirsgirêka kurd bi statûya Xoserîya Demokratîke mumkuno.

Şarê kurd heme platforman de hem talebanê xo ano ziwan, hem zî rayîrê çareserîye nîşan dano. Nika top destê rayedaranê dewleta tirkî de yo. Dewleta tirkî verva talebanê şarê kurdî de lazimo êdî xo ker û lâl nêkera...



## Ma qey em kêmî wan in

Xortek ji welatekî ereb çû Almanyayê ji bo zanîngehê bixwîne. Piştî demekê nameyek ji bavê xwe re şand û tê de wiha behsa Almanyayê kir; 'Bavê min ê ezîz, ev bajarê ku ez lê dimînin gelekî xweş û paqij e û xelkê bajêr jî gelek baş in. Lê di mijarekê de ez gelekî şerm dikim, ji ber mamosteyê min ê zanîngehê bi trênê tê û ez bi erebeya xwe ya Rangroverê diçim, ez gelekî ji xwe şerm dikim.'

Dema ev name giha bavê wî, bavê wî jî gelekî li ber kurê xwe ket û jê re nameyek şand û çekekî bi 10 milyon dolarî. Di nameyê de ji kurê xwe re wiha got: "Kurê min madem wiha ye, me kêmî xelkê neke û bera serê te her tim di nav hevalê te de bilind be, bi van pereyan tu jî trênekê bikire û bila trêna te her roj bibe zanîngehê û vegerîne. Ma qey em kêmî wan in."

*Dildarê Amede*




## Tiştanok (mamik)



**1-**Tiştek min heye
Çêlekoka zerik
Ji xwe re digere
De bêjin ew çi ye?"

**2-**Tiştek min heye
Çekmeq e, leq û peq e
Heçî destê xwe lê bide ehmeq e

**3**-Tiştek min heye
Çi li deştê bit, çi li nav beran
Çi li ber darê qurm û beran
Pê gurgan e guhên keran
Ew çi ye?

***Çavkanî: Mamikên Botanê***
***Berhevkar: Rênas Xendekî û Dildar Botî***

Me dîsa ji we re çend tiştanok ango mamikên xweş amade kirine. Bi hêvî me ku bi dilê we be. Her wiha em dixwazin hûn ji kerema xwe tiştên li ba xwe binivîsin û ji me re rêkin da ku em wan jî biweşînin.

**Bersivên me ev in:**
**1-**kundir **2-** Dûpişk, tûpişk **3-** kerûşk, kîvroşk, kêrguh

## Zûgotinok

Îro dîsa di tûrikê me de çend zûgotinok hene û em ê dîsa bi we hêjayan re par ve bikin. De werin em dest pê bikin û pirsa xwe ya her tim bipirsin.

→ Gelo kî dikare 3 caran li pey hev bêje:
**Şeb û şekir çûn diyarbekir**
**Şekir rûnişt deng nekir**
**Şeb rabû pesnê xwe kir**


→ Heke nikaribî wê bêjî ka vê biceribîne:
**Sêv gindirî min şêv xwar**
**Mişk gindirî min sêv xwar**

→ Heke ew jî nebû dê ji sedî sed ev çêbibe:
**Sêşem, duşem, çarşem, pêncşem, şeşşem**

**Çavkanî: Pirtûka Zûgotinokan a Mihemedê Kurdo**



## XAÇEPIRS




**JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ**

3. Teyrikek ku li Kurdistanê ji bo nêçîr pê tê kirin 5. Daçekek 7. Meşlûl
8. Bersiva neyênî 9. Merd, destvekirî 13. Hêwî, şilya axê
14. Belê, libê 16. Hejmarek 19. Bajarekî bakurê Kurdistanê
20. Agir 21. Lebateke sereke yê ku mirov pê dijî
22. Rêxistineke şoreşger a li Îrlandayê 25. Cînavkeke pirsiyariyê
26. Fatimok, cureyeke kevokên kovî 28. Karmax, bêjinga gir

**JI JOR BER BI JÊR**

1. Ziyayê maran, marê mezin
2. Bersiva erênî
3. cînavkek
4. Bajarekî bakurê Kurdistanê ku bi gola xwe tê naskirin
6. Firingî
10. Bizmarê mezin
11. Sibat, meha duyemîn
12. Rengek
15. Danekî rojê
17. Ar
18. Bajarekî bakurê Kurdistanê
20. Meheke biharê
23. Arvan
24. Kin
27. Rojeke hefteyê

Bersiva hefteya borî



# Ji min gotin

Farûqê Feroyî

Di dem û dewranên berê de, qewmê qedîm, xwedî zagon û dil birehm...

Yek ji wan zagonên vî qewmî, di derheqê rêbertiya wan de ye: Ev qewmê qedîm û dil birehm, ji çend salan carekê ji nav xwe rêberekî hildibijêrin û ji wî re wiha dibêjin;

-Ji îro pê ve tu rêberê me yî. Tu serê me yî û em jî lingê te ne. Tu yê rê nîşanî me bidî û em ê jî bimeşin. Tu ji me re bibêjî bimire, em ê bimirin û tu bibêjî bimîne em ê bimînin...

Rêberê bikêrhatî çi ji destê wî tê, ji bo qewmê xwe têdikoşe û wan ji xetereyan diparêze. Hetanî ku dikare di her warî de ji bo dewlemendiya qewmê xwe bikeve nav hewldanên bêhempa...

Çend salan vê rêbertiyê bi awayekî serkeftî, kêfxweş û dilşad didomîne.

Êvareke ji êvarên bi xatirxwestina rojê re; êleke kincreş û li ser pişta hespan, ji nişkê ve, li vî qewimî dibe mêvan...

Rûspiyên civakê û rêber bi hev re vê êlê bi mêvanperwerî pêşwazî dikin û mazûvaniya wan dikin. Cî nîşanî wan didin û koça vê êlê bi war dikin...

Paşê, rêberê qewmê qedîm û rûspiyên civakê li hev vedihebin û dibêjin;

-Ka em herin van mêvanên xwe ji nêz ve nas bikin...

Qewmê mêvanperwer, ji dilê xwe yê rast bi bawer, dimeşin û diherikin nav êlê. Kesên êlê yek bi yek vedihewin û kom dibin, qor digirin li hawirdora mazûvan...

Rêberê qewmê qedîm dest bi axaftinê dike û dibêje: "Em mazûvan û hûn jî mêvan. Daxwaza mazûvan nasîna mêvan e..."

Jîrekî êlê dibêje: "Em êleke ji qewmê gur in. Ango dayika me dêlegur û bavê me jî gur e. Em hetanî aniha li Asyaya Navîn dijiyan. Lê mixabin, Çînê dîwarên bilind dan pêşiya me. Em man li pişt wî dîwarî, wan ji me re nehiştin tu rê û derî. Aniha; em tî, birçî û neçar hatin, li warên we bûn mêvan." Rêberê qewmê qedîm dibêje:

-Belê heyran; em mazûvan û hûn jî mêvan, em xwedî û hûn jî cenan, em niştecih û hûn jî koçer, di zagona qewmê qedîm de ji mirovan re tu cudahî tune ye, lê dîsa jî hûn bi xêr hatin. Her azad û bextewar bin, wek hûn li mala xwe bin.

Piştî vê hevnasînê; mazûvan pişta xwe didin êla guran û pê ve, jîrik û êla xwe kêfa belek dikin...

Jîrikê êla guran dibêje; me cî da lingên xwe. Îjar divê em li gorî eslê xwe tev bigerin. Kesên li jîrik guhdarî dikin, di ber axaftina wî re dibêjin: "Divê em pilanên qirkirina wan peyde bikin!"

Jîrik dîsa dibêje; hûn bi baldarî tev bigerin û di destpêkê de divê em rûsipiyê wan ji xwe re bikin hevkar û xirpikekê ji rêberê wan re bikolin...

Jîrik ê gurxenêq, eyarê miyê li xwe dike û dadikeve nav qewmê qedîm. Digihîje kîjan rûspiyê di derheqê wan û qewmê wan de, di derheqê rêberê wan de tiştên herî baş dibêje. Pesnê wan û qenciya wan dide. Hetanî xwe di nav wan de bi cî dike û pê ve; îjar dest bi paşgotinî û fesadiya rêveberiya wan dike ku Rêber li ber çavên civakê reş bike!!!

Çi derew û bêbextiyên ku civakê pê birîndar bibe, pê biêşe bera stûyê Rêber dide!!!

Bi dek û dolaban, roj bi roj civakê li dijî Rêber bê bawer dikin...

Rojeke ji rojan, sibê zû dibe gurmegurma defê li ber deriyê Rêber. Rêber bi kelhê ji hundirê malê derdikeve û dinêre ku gel tev li pêşiya mala wî, li hawirdora kerekî civiyane. Matmayî dimîne û dipirse;

-We xêr e vê sibê zû?


Rûspiyên qewm dibêjin;

-Îro dema rêbertiya te bi dawî bû!!!

Bi vê gotina rûspiyan re; sê-çar xort, bi lez, wek gurên ku dadin miyekê, radihêlin rêber û paşpaşîko li kerê siwar dikin. Berê wî didin çiyayê ajalên dirinde...

Jîrik û êla xwe jî li derdora kerê direqisin û diranan disûn...

Piştî ewqas ked û fedakariya rêber, qewmê wî jê re dibe neyar û wî dikin êmê gur, hirç û keftaran! Do em mazûvan ew mêvan, em xwedî ew cenan, lê îro?





# Derhênerê kurd Hoşeng Mîrzayî

Sînemagerê kurd Hoşeng Mîrzayî di sala 1971'ê de, li bajarê Kudeşt ê bi ser parêzgeha Loristanê ve ji dayik bûye. Li Zanîngeha Deng û Dîmenê ya Tehranê di beşa derhêneriyê de xwendiye. Her wiha hevpolê derhêner Behmen Qubadî ye. Mîrzayî di 1990'î de dest bi derhêneriyê kiriye.

Mîrzayî bêtir di warê derhênan, montaj û nivîsandina belgefîlman de çalak bû û her wiha di nav sînemaya kurdî de wekî begefîlmsazekî navdar tê nasîn. Hoşeng Mîrzayî di seranserê temenê xwe de zêdetirî 30 berhemên kurt û 3 berhemên dirêj dahênane. Berhemên wî bi piranî bi kurdî ne û li rojhilatê Kurdistanê berhemên xwe afirandine. Mîrzayî bi fîlmên xwe yên wekî "Ronak", "Bi Xwedê re Dans Dikim...Jîn", "Tiştekî Mîna Çavên Min", "Noş", beşdarî festîvalên fîlman ên Spanyayê bû.

Bi berhemên xwe beşdarî zêdetirî 300 festîvalan bûye û gelek caran xelat wergirtine. Bi fîlma xwe "Tiştekî Mîna Çavên Min" ji destê derhênerê navdar Angelopulos xelata kurtefîlma herî baş wergirt.

Digel sînemayê Mîrzayî bi nîgarkêşî û wênekêşiya xwe jî gelek berhem dane. Mîrzayî jî wekî gelek hunermendên kurd ên li Îranê rastî tahdeyî û zextên rejîma Îranê hatiye û li ser vê yekê jî nerazîbûnên xwe bi rêyine cur bi cur derbiriye.

Hoşeng Mîrzayî ji ber nexweşiya koronayê demekê di nexweşxaneyê de ma û piştî 20 rojan di 21'ê adara 2021'ê de koça dawî kir. ***LORISTAN***

# Nazik Elî: Wê rojekê aştî û xweşî vegere kolanên vî bajarî

Navenda Nûçeyan

Di van rojên dawî de mijara reqsa baleyê ya ku keça kurd Nazik Elî li kolanên Qamişloyê pêşkêş kiribû, bûbû rojeveke ji derveyî nûçeyên şer û pevçûnan ên ku ji rojavayê Kurdistanê tên.

Em têlildarî reqsa wê ya li kolanên Qmişloyê bi Nazik Elî re axivîn.

Nazik der barê reqsa baleyê de dibêje: "Hunera baleyê gelekî bala min kişand, ew hunereke gelekî nazik û hestiyar e."

Ji bo hestên xwe yên di dema pêşandana vê hunerê de wiha got:

"Di van rojên dawî de dema ku ez ji Şamê hatim serdana Qamişloyê û min ew bajarê di nav tarîtiyê de dît, bi ser de ev nexweşiya pandemiyê bêtir ew kolan xalî kiribûn, min xwest ku hinekî rih bidim wan kolanên vala."

Dema min dest bi wê çalakiya xwe kir bi rastî nêrîna xelkê li min gelekî şaşwaz û matmayî bû, ji ber ew tiştekî nû bû. Lê paşê dema min têkliya germ a çapemeniyê dît hinekî dilê min rihetir bû."

Li ser pirseke derheqê armanca wê ji vê çalakiyê jî wiha bersiva me da:


"Armanca min ji vê çalakiyê ew bû ku ez bala xelkê bikişînim ser rewşa bajarê xwe. Her wiha min xwest ku bêjim her çendî ev rewşa wêran û nebaş dewam bike jî wê rojek bê ku aştî û xweşî jî vegere kolanên vî bajarî."

Nazik Elî di sala 2000'an li bajarê Qamişloyê ji dayik bûye, li zanîngeha Şamê beşa kîmyayê dixwîne. Berê govendên folklorê bala wê kişandiye û di dawiya sala 2018'an de semageriya baleyê bala wê kişandiye û dest bi vê hunerê kiriye.



# 'Hebû Tune Bû'

Yekemîn koma şanoyê ya jinan a li Rojava Teatra Sarya Baran di sala 2018'an de dest bi xebatên xwe kir û heta niha gelek lîstik çêkirine. Teatra Sarya Baran di adara 2020'an de ji ber vîrûsa koronayê hatibû girtin. Teatra Sarya Baran a di bin banê Tevgera Hîlala Zêrîn a Çand û Hunera Jinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê de xebatên xwe didomîne bi projeyeke çîrokan berê xwe dan bernameya televîzyonê jî.



Bernameya bi navê 'Hebû Tune Bû' niha li ser Jin Tv'ê di weşanê de ye. Şevîn Xelîl yek ji lîtikvanê komê ye û di bernameya Hebû Tune Bû de pêşkêşvaniyê dike. Xelîl der barê bernameya Hebû Tûne Bû de diyar kir ku bi belavbûna koronayê re xebatên wan rawestiyane û wiha got: "Piştî belavbûna vîrûsa koronayê li herêmê me karê xwe li ser înternetê dewam kir. Me çîrokên xwe tomar kirin da ku xwendekar ji lêkolînan bi paş ve nekevin. Piştre me bi Jin TV'ê re hevkarî kir û dest bi kêşandinê kir."

Şevîn Xelîl di axaftina xwe de bal kişand ser armanca vê xebatê û wiha got: "Em vê xebatê di warê parastina zimanê dayikê û parastina çand û kevneşopiyên gel de girîng dibînin. Em dizanin ku çîrok û çirçîrok dîroka gelan vedibêjin. Gelek êrîşên bi armanca tunekirina çanda me hene û em dixwazin bersivê bidin wan. Em armanc dikin ku vê çandê biparêzin û bi xebata xwe ya Hebû Tune Bû bêhtir xwe bigihînin temaşevanan."

Lîstikvana Teatra Sarya Baran Şevîn Xelîl diyar kir ku projeya Hebû Tune Bû dê salekê dirêj bibe û wiha got: "Çîrokên ku em vedibêjin, çîrokên naskirî ne. Em van çîrokên ku em ji dayik û dapîrên xwe hîn dibin, pêşkêşî temaşevanan dikin." ***QAMIŞLO***

xwebûn

19-25 Nîsan 2021 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 5 TL Hejmar: 70

**İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi:**
Kadri Esen
**Sorumlu Yazıişleri Müdürü:**
İdris Gürmez
**Yayın Danışma Kurulu:**
Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco
**Yayın Türü:** Haftalık Yaygın Süreli

**Yönetim Yeri:** Kooperatifler Mahallesi Cahit Sıtkı Tarancı Sokak İstanbul Apartmanı No: 18/6 **Yenişehir / Diyarbakır**
**Baskı:** Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı **Bağlar / Diyarbakır**

*Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.*


Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

# Bajarê sê beşên Kurdistanê bi hev ve dike: Zaxo



Keştiya Alalû
Agît Yazar

Zaxo, di navbera çiyayên welê de ye; ew silsileya rêzeçiyayan, nola xetên cot, nola pêlên behrê li pişt hev in. Di navbera her du rêzeçiyayan de, erdên nola kefa dest, wanî ripîrast hene





Şevê din min xewnek dît!

Bi qasî ez xewna xwe bi ruh tînim, xewna min wanî bû: min dît ez di nav zeviyeke beyar û hinekî birewa/nedawî de bûm. Bi gavên aram û hinekî jî bi çavdêrî dimeşiyam. Paşê ez çûm li ber kendalekî sekinîm. Kendal ji xweber diherikî li ber nigê min. Ez bi xwar ve hatim, min kulmek ax ji axa kendal rakir û min di destê xwe de firidand.

Axa kendêl, nola hinê hûr û nola pîşo nermik bû. Min di dilê xwe de digot: meriv çi bi zar bike li ser vê erda beyar, ka xwedê dizane bê ew ê yeka wê çendan bide!

Hesteke gelekî aram dida min. Paşê min di ber kendal de çong veda û min bi nahperûkan, axa kendêl vexepirand. Bi vexepirandinê re, qelemek ket destê min. Min dîsa vexepirand. Qelemeke bi rengekî din ket destê min. Û min vexepirandina axa kendêl kudand. Her carê qelemek bi rengekî cuda bi dest min ve dihat.

Bi vî awayî ji hemû rengan, min gurzek qelem berhev kir.

Min xwe bi xwe ji xwe re di dilê xwe de digot: Aha ev qelemên hanê, ew ê êdî têra min bikin.

Gava li min bû sibe ez rabûm li ser xwe, hema hindik mabû ez derketama derve. Ji min wer dihat ku ez hema derkevim li ber devê derî, ez ê xwe di nav wê zeviyê de û li ber wî kendalê axê bibînim; ewqas xewn bi min rasteqîn dihat.

Min ev xewna xwe di bihara sala 2019'an de dîtibû û hingê min di rûpela xwe ya facebookê de parve kiribû. Gelek şîroveyên tabîrbêjên xewnan li binî hatibûn parvekirin. Hema hema rewşa jiyana min a dema li pêş ku ez aniha dijîm, şîrove kiribûn.

Seyahên navdar, ji Marco Polo bigire heta Kristof Kolomb, Americo Vespucci û heta Evliya Çelebî, her yek ji wan xwedî serpêhatiyeke awarte bûne.

Nizanim ev xewna min, ew ê min bigihîne van seyahên mohra xwe li dîrokê xistine yan na. Kurmê gerê jî, nola kurmê tiryakê ye; carekê meriv dest pê bike, zû bi zû meriv nikare jê biqere.

Gera min a heta niha, ji bo min ev hîn destpêk e. Lewra bi raya min gerokek, gerştiyarek ango seyahekî serkeftî, di destpêkê de divê ewil welatê xwe, dîroka xwe baş nas bike. Piştî hingê dikare li welatên din bigere û cîhanê nas bike. Ya ku min ji xwe re kiriye armanc jî ev e. Bêguman ez xwe ji wan seyahên navdar tevdekan sûdewertir dibînim. Lewra ez bi vê yekê baş serwext im go pêşiyên min, dê û bavê mirovahiyê ne. Ango mirovahiya îroj a pêşketî, çavên xwe di dergûşa pêşiyên me de vekirine. Cîhan ji erd heta ezman, deyndarê pêşiyên me ne. Ji ber ku min esalet û edeba xwe ji pêşiyên xwe yên mineta wan li ser mirovahiya pêşketî heye wergirtiye, ez xwe tibabekî bi siûd û bextewar dibînim. Xwezî bi dilê wî kurdî, yê ji vê zanînê re serwext.

Ez dibêjim welatê min. Lê mixabin welatê min jî ketiye zikê çar dêwan. Heta meriv xwe ji nav qîlê dêwekî derbas dike û digihîne nava hûrê wî, benê pişta meriv diqete. Gera li welatê me, zehmetrîn e ji çûyîna Sibiryayê. Çi! Na na wele ji çûyîna li ser hîvê jî zehmetir e. Çûyîna Sibiryayê jî û ya li ser hîvê jî, tenê li derfetên madî dinêre. Le ya welatê me?

**Deriyê Xabûrê - Îbrahîm Xelîl**

Di lêpirsîna xalên nasnameyan, nizanim di ya çendik û çendemîn de em gihaştin deriyê Xabûrê. Ji ber şewba koronayê û kêmbûna bazirganiyê, qerebalixî zêde tune bû.

Em ji bo karûbarê vîzeyê ji otobosê peyabûn û em li dû hev rêz bûn. Xortek li pişt min e. Diyar e ku ew ji çûyîn û hatinê re gelekî serbest e. Ez ji wî xortî dipirsim, dibêjim: Em gelekî bi hêsanî derbas bûn, gelo veger jî ew çend hêsan e? Xortê Qoserî kesereke kûr dikişîne, dibêje: "Ji kureeee abê! weleh li vegerê îmana me dileqînin. Carna ji kêfî malên me desteser dikin. Wê rojê li vegerê, her derê me "dîdîk dîdîk" kirin. Di nava çentê yekî de, taximek cilên binî yê jina hebû. Ji mexsûsî ew derpik rakirin hewayê, da ku her kes bibîne û ew çirandin avêtin dera hanê. Diyar bû wî mirovî ew diyarî ji jina xwe re anîbû. Weleh gelekî li zora me çû abê!"...

Piştî em vîzeya xwe distînin, em derbasî deriyê hêla Kurdistanê dibin. Ji deriyê hêla Kurdistanê re dibêjin, Deriyê Îbrahîm Xelîl. Piştî kontrola testa koronayê, em ji deriyê Îbrahîm Xelîl jî derbas dibin diçin Zaxoyê.

Ala Kurdistanê, ya li ezmanê şikişîn li ba dibe, wekî her kurdî min jî şanaz dike. Lê bi mebesta şikandina rûmeta kurdan, libabûna "diyariyên" kurdan ên li welatê xwe di gumrukên biyaniyan re, min ew çend hêrs û dilşikestî dike.

Ka em lê binêrin, bê ev hestên min ên şanaz, hêrs û xemgîn; ango yên têkilhev ew ê min li ku bigerînin.

**Zaxo**

Zaxo, di navbera çiyayên welê de ye; ew silsileya rêzeçiyayan, nola xetên cot, nola pêlên behrê li pişt hev in. Di navbera her du rêzeçiyayan de, erdên nola kefa dest, wanî ripîrast hene. Meriv dibêje qey xwedayê mezin, ev rêzeçiyayên hanê, ji bo kurd baş lê bidebirin, wanî xweşik afirandine.

Ji van çiyayên li dora Zaxoyê yên navdar, rêzeçiyayê bi navê Kêrre, Xamtûr, Zirr/Gir, Bêxêr û yê Cûdî hene. Li hêla rojhilat jî, çiyayê Metînan, nola paşmêrekî xwe daye li pişt van çiyayên hanê.

Di derheqê navê Zaxo yê de, gelek nerînên ji hev cuda hene. Wek nimûne: Azoxîz, Zaxota, Zaxaryos, Zagxwa, Azyaxo, Zêr-nûh, Za-xok û Zê-xwîn.

Bi Aramî: Zaxota, ango tê wateya "zafer"ê. Navê Zagxwa jî li navê hozeke cihûyan rûdinê. Lewra heta sala 1950'î, hozeke kurdên cihû bi navê Zagxwa li Zaxoyê hebûye. Di dema niha de jî li Zaxoyê taxeke bi navê Taxa Cihûyan heye. Ev taxa hanê di giraveke di navbera çemê Xabûrê de dimîne.

Ji wan kurdên cihû, kesekî ji wan misilman bûbin ne tê de, wekî din tu kesek ji wan nemaye. Wexta dewleta Îsraîl tê avakirin, tevdekên wan koçî Îsraîlê dikin. Li ser navê şopên wan kurdên cihû, tenê kenîşteyek ango sînegogeke kavil li vê taxa wan maye.

Wekî din nivîskarê aramî yê bi navê Yuhanne, di kitêba xwe ya bi navê Dasnaî de ji Zaxoyê re dibêje: Azyaxo kurê Diyaxo ye. Diyaxo jî kurê Nûh e. Azyaxo, di wexteke gelekî kevn de, keyayê vê herêmê bûye.

Nivîskar Enwer Mayî jî di kitêba xwe ya bi navê 'Kurd di Behdînan de' dibêje: Navê Zaxoyê ji Zêr-Nûh hatiye. Zêr-Nûh/Jêr-Nûh, ango gundê dikeve jêra welatê Nûh.

Hinek kes jî dibêjin: Zê-xwîn, ango bajarê pir xwîn lê hatiye rijandin û xwîn jê zaye.

Dîsa jî hinek kesên din dibêjin Za-Xok. Ango cihê çem û rûbar lê gewimiye.

Lê ez dixwazim fikra xwe li van navan zêde bikim: Bi raya min, ev navê Zaxo, yekser bi navê Zagrosê ve girêdayî ye.

Di kolanên Zaxoyê de jiyan çawa diherike?

Dewlemendî û xizanî di nav hev de ye. Bajarekî nû bi navê Nîw Zaxo, li ser Zaxoya kevn hatiye avakirin. Nola meriv rahêle Parîsê û bibe li rexa bajarekî xizan yê Hindistanê dîne.

Ji ber ku Zaxo bi qasî 10 km nêzî deriyê Xabûrê ye, mercên wê yên pêşketina aborî, pir guncaw e.

Bajarê Zaxoyê, sê beşên welat digihîne hev; Bakur, Başûr û Rojava.

Li Zaxoyê, kurdên misilman, êzdî û xiristiyan dijîn. Dibe ku çendek ji kurdên cihû jî hebin. Ji van hemû baweriyan, mabedên wan ên ayînî hene û her kes di baweriyên xwe de serbest e.

Di nav kolanên Zaxoyê de, ji TV'ên dikanên esnafan, dengê rêzefîlmê tirkan ê bi navê "Ertugrul Gazî" berz dibin. Rêzefîlm, bi dublaja kurdî tê weşandin û ev rêzefîlm gelekî di rewacê de ye. Gelek kes bi dilbijandineke mezin xwe hînî zimanê tirkî dikin.

Ez bi hestên tevlihev di nav çarşiya bajêr de dimeşim. Ez ji seyarfiroşekî li bazarê nîvkîlo xurme dikirim. Xurmefiroş ji min dipirse, dibêje "tu ji Diyarbakir î?" Ez dibêjim na ez ne ji Amedê me. Ez ji Mêrdînê me. Gotina duyemîn a ji devê xurmefiroş derdikeve ev e: "Tu îşev nabî mêvanê min?"

Ez destê xwe datînim ser pêsîra xwe ya çepê û ji kûrahiya dilê xwe, malavatiya kalemêrê xurmefiroş dikim. Ez xurmên xwe dixînim çeltikê pişta xwe û di kolanekê de dimeşim.

Du kalemêrên bi şal û şapik, nola du şêrên di nav salan de çûyî, xwe dane li rex hev û li ser dika li ber dikanekê rûniştî ne. Ez silavekê didim wan diçim di navbera wan de rûdinim. Lingê yek îlim ramedandî ye. Ev yek ji bala çavên min nafilite. Ez hîn dibim ku ew di şerê li hemberî Seddam de, di sala 1991'ê de ji lingê xwe yê rastê birîndar dibe. Ez di dilê xwe de navê kalemêrê xazî datînim: Kalemêrê Lingzêrîn.

Xwînerên ezîz. Di xeleka tê de em ê biçin ser kaniya "Xeman" a li miqabilî keleha Şabanî ye, avê jê vexwin. Da ku xemên me jî li ber ava wê ya xweş biherikin, em bi hev re xemên xwe li dû xwe bihêlin. Paşê jî em ê rahêjin şahiyên xwe, şanaziyên xwe li pişta xwe bikin û em ê bi hev re li cih warên dîrokî yên Zaxoya mêvanperwer, bigerin. Zaxoya ku ji "artêşa deh hezaran" ya Ksenefon re bûye mazûban, rêber û rawestegeha dawî ya vegera wan.

***(didome)***

